

K.T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZÎMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZÎMAN û ÇANDA KURDÎ

TezaLîsansa Bilind



NÛJENXAZÎ DI RÛXSARA HELBESTÊN ŞÊX NÛRÎ DA

SARDAR FARHAD ABDULLAH
15950001080

Şewirmend
Doç.Dr. Nesim SÖNMEZ

WAN- 2017

**T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

Yüksek Lisans Tezi



NÛJENXAZÎ DI RÛXSARA HELBESTÊN ŞÊX NÛRÎ DA

**SARDAR FARHAD ABDULLAH
15950001080**

**Danışman
Doç.Dr. NESİM SÖNMEZ**

VAN – 2017

ACKNOWLEDGMENT

I thank all who in one way or another contributed in the completion of this thesis. First, I give thanks to God for protection and ability to do work.

I would like to express my sincere gratitude to my supervisor Assistant. Prof. Dr. NESIMSÖNMEZ for his patience, kind support, immense knowledge, motivation, directions and thorough guidance during my research work. His guidance helped me in all the time of research. At many stages of this project I benefited from his advice, particularly so when exploring new ideas. His positive evaluating and confidence in my research inspired me and gave me confidence. His careful editing contributed enormously to the production of this thesis.

I would like to thank all my friends, who have supported me throughout the entire process, both by keeping me harmonious and helping me putting pieces together. Your friendship makes my life a wonderful experience. I cannot list all of them names here. I will be grateful forever for your kindness.

Last but not the least, I have to thank my parents for their love, encouraged me, prayed for me, and supported me throughout my life. Thank you both for giving me strength to reach for the starts and chase my dreams.

SARDAR FARHAD ABDULLAH
VAN - 2017

TABLE OF CONTENTS

ACKNOWLEDGMENT	I
TABLE OF CONTENTS	II
KURTE	IV
ÖZET	1
DESTPÊK:	5
1. Serdema Jîyana	6
1.1 Serdema Jîyana Şêx Nûrî Şêx Salih (1896- 1958).....	6
1.1.1 Sedema Derekî	6
1.1.2 Sedema Navekî.....	6
1.2 Rewşenbîriya Şêx Nûrî Şêx Salih.....	8
1.3 Pileya Xwendinê.....	8
1.4 Şêx Nûrî û Karê Rojnamegerî.....	10
1.4.1 Belavkirina Berhemên Xwe Di Rojname û Kovarên Wê Serdemê	10
1.4.2 Xebata Şêx Nûrî Di Rojnamegerîya Serdema Xwe da	11
1.5 Şêx Nûrî û Hunera Stranan	12
1.6 Şêx Nûrî û Vekolîna Wêjeyî.....	13
1.6.1 Şêx Nûrî di gotarên xwe da behsa van mijarana dike.....	14
1.6.2 Paşê şêwazê dabeşî sê cûreyî dike.....	15
1.7 Şêx Nûrî û Wergerrîn:	16
1.8 Bizava Nûxwazîya Helbesta Kurdî:.....	17
2. NÛXWAZÎ DI RUXSARA HELBESTÊN ŞÊX NÛRÎ DA	24
2.1 Li gor ‘Ebdurezaq Bîmar nûxwazî bi sê gavan da derbas dibe.....	24
2.2 Hinek Hunerên Helbestî:	26
2.2.1 Mustezad	28
2.2.2 Operêt.....	31
2.2.3 Çîroke Helbest (Çîrokên Helbestî)	35
2.2.4 Tesmît.....	37
[أولمير الدين كفرنو السماوات والنار فكانتار ثقافتناهما وجعلنا من الماء كلشي وحى اقلابو مئون] [الانبياء- ايه 30]	41
3. Hinek Hêmanên Nû Yên Helbestên Şêx Nûrî:	42
3.1 Kêş.....	44
3.1.1 Kêşa 'Erûzî û Kêşa Xwemaliya Kîteyî	46
3.1.2 Tevlîhevkirina Kêşan	48
3.2 Beşavend	50

3.2.1	Nûvekirina Beşavenda Çarîn.....	53
3.2.2	Nûvekirina Beşavenda Pêncîne:	56
3.2.3	Nûvekirina Beşavenda Mustezadan.....	59
3.3	Wêneyê Helbestî:.....	61
3.3.1	Wêneyê Hestî û Wêneyê Zîhnî:.....	63
3.3.1.1	Wêneyê Hestî.....	63
3.3.1.2	Wêneyê Dîtinê (bînîn).....	63
3.3.1.3	Wêneyê Bihîstinê	64
3.3.1.4	Wêneyê Destlêdanê.....	65
3.3.1.5	Wêneyê Bêhnkirinê.....	65
3.3.1.6	Wêneyê Çêjkirinê.....	66
3.3.2	Wêneyê Zîhnî:	66
3.3.3	Wêneyê Rawestayî- Wêneyê Livî (Lebatî):	67
3.3.3.1	Wêneyê Rawestayî:.....	67
3.3.3.2	Wêneyê Livî (Lebatî):	68
3.3.3.3	Wêneyê Tak û Wêneyê Tevlihev:.....	69

KURTE

Ev vekolîna li dû pêşgotinê dabeşî ser sê bêşî hatîye kirin û encam û çavkanî û kuretaya mijarê jî bi ‘erebî û îngilîzî hatîye nivîsandin û mijar (vekolîn) xelas bûye.

Ev beşa ji jyan û rewşenbîrîya Şêx Nûrî pek tê ku dabeşî ser çend teweran bûye, wek; serdema jîyana Şêx Nûrî, çimkî erk û bandora serdemê gelekî li ser bîr û boçûn û dahênana her helbestvanî heye. Herwiha ew bandora li ser rewşenbîrîya giştî ya helbestvanan jî heye, helbestvan çî xwendîye û pisporî û şarezayîya helbestvan di çî warî da hebû, çimkî asta rewşenbîrîya helbestvanan di helbestên wan da olanê dide, rewşenbîrîya helbestvanan çiqasî zêde be bîrkerin û dîtîna wan ya helbestî di helbestên wan da hewqas kûrtir dibe.

Îjar ‘‘Şêx Nûrî û Gotarên Rojnamegerî’’, di vir da jî behsa ew rojnameyên ku Şêx Nûrî têda xebitîye û herwiha ew rojnameyên ku Şêx Nûrî têda nexebitîye lê berhemên wêjeyî û helbestên xwe têda belav kirîye hatîye kirin. Herweha di vê beşê da behsa Şêx Nûrî û stran (goranî) hatîye kirin, çimkî di ser erk û rola Şêx Nûrî ya rewşenbîrî wêjeyî da di stranbêjîyê da jî payeyeke wî ya bilind û dîyar hebû, di sazîyên aheng û stranan da bi taybetî coş daye. Ji bilî van ev beşa li gor dîtîna gotarên rojnamegerî ya wî ve behsa aliyê ramiyarî (sîyasî), civakî û nîştîmanîya Şêx Nûrî dike, herwiha behsa rêzegotarên wî jî dike ku ji bo wêjeya kurdî daye berhev û di dawîyê da jî behsa wergerrînên Şêx Nûrî dike ku ji farisî, tirkî û ‘erebî helbest û berhem wergerrandîye kurdî.

Ev beşa ji bo hêmanên nû yên rûxsara helbestên Şêx Nûrî hatîye veqedandin, hinek hunerên nû yên helbestî li xwe digre ku nûvekirinê têda encam daye wek; mustezad, operêt, helbestên çîrokî û tesmît.

Ev beşa jî li ser hinek hêmanên nû yên helbestên Şêx Nûrî şîroveyan dike wek; kêş û beşavendên wêneyê helbestî û zimanê helbestî.

ÖZET

Bu araştırma önsözden sonra üç bölüme ayrılmıştır ve sonuç, kaynakça ile araştırma özeti de Arapça ve İngilizce yazılmış olup araştırma tamamlanmıştır.

Bu bölüm Şeyh Nuri'nin yaşamı ile aydın kişiliği ve entelektüeliğinden meydana gelmektedir ve aşağıda belirttiğimiz birkaç alt konuya ayrılmıştır: Şeyh Nuri'nin yaşadığı dönem; Bilindiği gibi her şairin yaşadığı dönemin onların fikir, eser ve görüşleri üzerinde hatırı sayılır derecede etkisi ve rolü vardır.

Ayrıca şairlerin genel kültürlerini de etkilemektedir, şair ne okumuş ve şairin uzmanlık alanı hangi yönde daha etkilidir, çünkü şairlerin görüşleri, entelektüel ile aydın kişilikleri onların şiirlerinde açıkça dışa vurmaktadır. Şairlerin kültür ve aydınlık seviyeleri ne kadar yüksek olursa onların şiirsel görüş ve düşünceleri o denli akıcı ve derin olur.

Şeyh Nuri ve Gazetecilik Makaleleri; Burada da Şeyh Nuri'nin aktif olarak çalıştığı gazeteler ile aktif olarak çalışmadığı halde edebi eser ve şiirlerinin yayınlandığı gazetelerden bahsedilmektedir. Ayrıca burada Şeyh Nuri ve türkülerden bahsedilmektedir, çünkü Şeyh Nuri'nin edebi aydın kişiliği, kültür ve yaratıcılığının rol ve etkisinin yanı sıra türkü, şarkı ile halk ezgileri alanında da önemli bir yere sahip olduğu ve bazı kültürel etkinliklerde türkü ve şarkı söylediği de bilinmektedir. Bunlardan ayrı olarak burada Şeyh Nuri'nin gazetecilik makalelerinden de anlaşılacağı gibi onun siyasi, toplumsal ve vatanseverlik yönleri de ele alınmaktadır.

Ayrıca onun Kürt edebiyatı için derlediği makale dizilerinden ve Türkçe, Farsça ile Arapçadan yaptığı şiir ile edebi eser çevirilerinden de bahsedilmektedir.

Bu bölümde Şeyh Nuri'nin şiirlerinde kullandığı modern tarzdaki edebi unsurların anlatımına yer verilmektedir, müstezad, opera ve öykü tarzındaki şiirler ile tesmit gibi modern edebi unsurları kapsamaktadır.

Bu son bölümde de Şeyh Nuri'nin şiirlerinde kullandığı şiir kalıpları, kafiye, imgecilik ile şiirsel dil gibi bazı modern edebi unsurların üzerine yoğunlaşarak onlar hakkında bilgiler vermektedir.

ABSTRACT

This thesis is prepared under the title (The Role of the poet shekhNoori shekh salih in Kurdish Poetry Renovation).It deals with the Kurdish Poetry renovate movement that started at the beginning of the twentieth century in Kurdish portry showing the posts attribution and role in crystallizing and enriching the movement, side by side eith other Kurdish progressive poets such as Goran and others who exerted collective efforts to make such a movement successful by getting aware of the literature of neighboring peoples especially Turkush contemporary poetry and nourishing from the national public heritage.This they were able to put a firm foundation for a renovation movement which began at the start of the twentieth century, flourished in fiftes and witnessed a tremendous progres in seventies.

The thesis consists of an introduction and three chapters followed by some conclusions and a list of bibliographies in addition to two abstracts in both Arabic and English.

Is devoted to the life of the pot his education, studying different topics related to this field such as: The posts education, his standard of studying, his role in jpurnalism his activity as a signer his attribution in theoretical literary studies and his role in translating literary works into Kurdish in both poetry and prose. Then the chapter presents the movement of renovation Kurdish poetry and the reasons behind it.

Has two sections: section one studies the traditional tropics that the poet dealt with in a new spirit such as: description, elegy and eulogy. The second section concentrares on new living topics related to different aspects of life, like: Science and knowledge, economic circus tances, feminism social and philosophical poetry for children.

Deals with some new characteristics of the poetical from presented by the poet. It has two section: section one is about some poetical genres the poet tackled creatively such as:Operette, poetical stories.

While the second section studies the poetical elements in which the poet has made his own renovations like: meter, rhyme, poetical image and poetical language.

PÊŞGOTIN

Ev vekolîna zanistî bi navê ‘‘ Nûjenxazî Di Rûxsara Helbestên Şêx Nûrî da’’ hatiye amadekirin, xebateke ji bo şîrovekirina ew hêmanên nû ku Şêx Nûrî anîye nav helbesta kurdî.Şêx Nûrî ew hêmanên nûvekirinê hinek bi wergirtina ji zimanên cîranan (fars, tirk û ‘ereb) hinek bi zarîkirin û dahênana xwe ve anîye, di hemû rewşên anîna wan da ew alîyên hûr û ciwan yekem car di helbesta kurdî da hatine bikar anîn.Ev xebata Şêx Nûrî ji bo wê demê daberizeke (tekan, hamle) bihêz bû ji bo şikandina bend û destûra helbesta klasîkîya kurdî û vekirina rêçkeyeke teze ji bo helbestvanên paş xwe.Rast e Şêx Nûrî di wê xebat û hewla xwe da bi tenê nebû, dibe ku di demên pêş wî da jî hinek hewl û xebatên biçûk biçûk hebin lê sînoren wan xebat û hewlana hewqas berfirehtir nebûn û xebatên bêhêz bûn.

Di serdema Şêx Nûrî da li Jêra Kurdistanê (Başûrê Kurdistanê) çendhelbestvanên din jî bi dahênan û nûvekirinê ve xerîk (meşxûl) bûn, wek; Goran, Reşîd Necîb û ‘Evdirehman Beg. Di vir da xala giring EW e ku xeabtên Reşîd Necîb û ‘Evdirehman Beg nagên xebat û hewlên Şêx Nûrî û Goran lê wan jî hinek tiştên nû û teze anîne nav helbesta kurdî.Her çiqas Goran paşê hinek dahênan û nûvekirin di helbesta kurdî da kiri be û şîyana wî ji bo pêşvebirina bizava nûvekirina helbesta kurdî hebû jî lê di serî da Şêx Nûrî erk û rola serekî û bingehî listîye (dîye).

Çimkî Şêx Nûrî gelekî zû tevlî xebatên ramyarî û rojnamegerîyê bibû, Şêx Nûrî di rojnameyên salên bîstan yê sedsala raborî da xebitî bû, ji bilî helbestan mijarên ramyarî, rewşenbîrî û civakî jî belav kiriye.Ji ber hukmê xebatên wî yê di çend rojnameyan da ji bo belavkirina helbestên xwe pêşîya wî vekirî bû, lê dibe ku helbestvanên nûxwaz yên wê serdemê xwedî derfetek wiha nebûn, ji ber yekê wiha bû ku bandora helbestên Şêx Nûrî hebe û ji alîyê din jî ji bo Şêx Nûrî handanek bû ku zêdetir tiştên nû dabihêne û belav bike.

Mijara vê nameyê ji bo şîrove û diyarkirina hêmanên nûvekirina helbesta kurdî ye li ba Şêx Nûrî (ji alîyê wî ve), li rûyê ruxsarê jî me hewl da zêdetir em li ser ew xalên nû rawestin ku yekem car Şêx Nûrî bikar anîne û ew bîrên teze ne ji bo mijara helbesta wê serdemê. Rast e Goran jî zû xerîkî helbesta nû bû lê Şêx Nûrî ji ber belavkirina berhemên xwe ve kete pêş wî, ew tezekirina Şêx Nûrî û hevalên wî zêdetir li jêr bandora helbestên helbestvanên nûxwaz yên tirk bû, Hemû helbestvanên nûxwaz yên Kurd wê demê di wê rojinê re

temaşeyê wêjeya pêşketî ya bîyanîyan dikirin, kê m yan gelek sûd jê werdigirtin û dahênana wêjeya xwe pê bertîl (muturbe) û zengîn dikirin.

Şêx Nûrî behsa gelek babetên civakî, ramyarî, aborî û nîştimanî kirîye, yan her mijarên teze bûn ji bo helbestê yan jî Şêx Nûrî bi çavekî teze ve temaşeyê wan dikir û dahênan têda dikir. Di heman demê da jî ji aliyê hunerî ve hûrgilîyê temsîl dike û gelek hêmanên nû anîye nav helbesta kurdî ku pêştir têda tunebûn, yan bi vê cûreyê nebûn di warê kêş, dabeşbûna beşavendan, mustezad û dûbarekirin, herwiha wêneyê nû yê helbestî û bikaranîna peyvên taybet yê serdema xwe û ... Ev nameya ji xwe re wek erk zane ku hewqas derfet hebe li ew hêmanên nû vekolîne û derxe, bi vê vekolînê ve heta radeyekê derdikeve ku gelo Şêx Nûrî çi erk (rol) di nûvekirina helbesta kurdî da diye û çawa dahênanên xwe gihandîye encamê û çi erk bandora wî li ser helbestvanên serdema xwe û dû xwe hebû ?... Herwiha bi vê nameyê ve derdikeve ku Şêx Nûrî yek ji ew pêşengên bizava helbesta nû ya kurdî ye û şîyan û xurtbûna wî ji seretayê bizavê da diyar e, bi taybetî ku Şêx Nûrî rewşenbîrekî diyar yê serdema xwe bû û di teorîya rexneya wêjeyî da jî xwedîyê erk û bandoreke bihêz bû û gelek gotarên wî yê di vî warî da ji bo zelalkirina gelek aliyê wêje û helbestê ku kêş, beşavend û hunerên rewanbêjî û şewazê û... hwd hebûn û gelekî bandordar bûn li ser wêjeya wê demê.

Ev hev kêşa mijarî ya di navbera teorîya pratîkî li ba Şêx Nûrî yek ji EW sedemên serkeftin û pêşketinê bû li qada nûvekirina helbesta kurdî da.

DESTPÊK

Şêx Nûrî nivîskar, rojnamenûs û helbestvanekî nûxwaz yê seretayê sedsala bîsta ye û rol û erkeke giring dîye di warê rewşenbîrî û bi taybetî di nûvekirina helbesta kurdî da. Şêx Nûrî berpalkêkî (kollege) bihêz yê helbesta nûya kurdî bû, loma divê di derbarê nûvekirina wî da vekolîn were kirin û bê nivîsandin. Şêx Nûrî gelek hêman û mijarên helbesta nû ji bo yekem car anîye nav helbesta kurdî, pêwîste ev hêman û mijarana were destnîşankirin û têkevin ber fikr û dîtina xwendevanan ji bo ku agahdarê dahênanên Şêx Nûrî bin di warê helbesta nû ya kurdî da. Yekem pêşdehatina (tekan) tûnd û xurt ya nûvekirina helbesta kurdî heta nika jî ew bû ku di dawîya salên bîstan ya sedsala bîstem da Şêx Nûrî û hevalên wî anîne nav helbesta kurdî. Bi vekolîn û lêgerînan ve alîyê giring yê wê bizava nûxwazîyê ji bo me derdikeve ku ew hêmanên nû yê helbestên Şêx Nûrî bûne bingehên berdewamîya pêvajoya helbesta kurdî.

Helbestvanên nûxwaz yê seretayê sedsala bîstem her yek bi pê şîyan û derfetên xwe ve hewl dane dahênan û pêşketinê di helbesta kurdî da bikin, ew hewl û xebatên ku her yek ji wan helbestvanan da bûn heta nika jî bi temamî ji hev nehatine cudakirin. Hoyeke din ya hîljartina vê mijarê ew e ku derbikeve Şêx Nûrî di çavê hevalên xwe yê nûxwaz da çi kirîye û çi bandor li wan kirîye û herwiha li rûyê demê ve ketîye pêş yan dawîya wan, li rûyê dahênanan jî ji kîjana zêdetir yan kêmtir kirîye û di cûreyê dahênanan da jî çi cûdahîya wî digel hevalên wî da heye.

1. SERDEMA JÎYANA

1.1 Serdema Jîyana Şêx Nûrî Şêx Salih (1896- 1958)

Şêx Nuri Şêx Salih di demekê da hate cîhanê ku gelek bûyerên mezin û girîng yê cîhanî û neteweyî têda qewimîne û bandora wan ya mezin li ser bizavên ramiyarî (sîyasî), aborî, nîştimanî û netewayetîya kurd hebû. Herwiha van rewşên asê jî di warê rewşenbîrî û wêjeyî da olan dane (deng vedane) û helbestvanên wê demê jî bi hest û ûcdan û bîr û fikrên xwe yê serdemî tevî bûyeran bûne û helwesta wan ya taybet hebû ji bo hişyarkirin û arastekirina civaka kurdî.

Ev sedemên serekî bûn digel hinek sedemên hêsînî (xudî) ku bûne hoy di wê serdemê da gelek helbestvanên kurd derkevin bi şîyan û karîna xwe ya dahênane di warê rewşenbîrîyê da bandora wan ya diyar û eşkere û serdemî berçav bibe. Em dikarin ev sedemên ku bandora wan li ser wê serdemê hebûn bikin du cûre.

1.1.1 Sedema Derekî

Ev sedema xwe di Cenga Yekem û Duyem ya Cîhanî û bandora wêjeya biyanî, bi taybetî wêjeya cîranên kurdan (tirk, fars û ‘ereb) da dibîne ku yekser (rastewxo) bandora wan ya cuda cuda li ser bizava rewşenbîrî, wêjeyî û helbestî ya kurdî hebû, herwiha ji bilî wêjeya ewrûpî ku bi rêya wêjeya cîranan hatîye nava wêjeya kurdî.

1.1.2 Sedema Navekî

Ev sedema jî xwe di bilindbûna asta hişyarî ya netewayetî û rewşenbîrî di encama bobelatên mezin yê cîhanî û bilindbûna pileya xwendevanîya gel li dû vekirina dibistanên taybet û handana (teşwîk) bi zimanê kurdî û herwiha derçûna çend kovar û rojnameyên kurdî û damezrandina çapxaneyên cuda cuda li çend alîyê Kurdistanê ji bo çapkirina pirtûk, kovar, rojname û belavkirina rewşenbîrîyê di nava pirranîya gel da dibîne.

Ji bilî van jî damezrandina hinek komeleyên cuda cuda; Cemîyeta Rewşenbîrî û zanistên weke (Cemîyeta Zanistî ya Kurdan) (Kerîm, 1985), (Yaneyê (Klûb) Serkewtin).

Tiştêkî eşkere ye ku pêş rûxana (hilweşîna) Împaratoriya Osmanî, Kurdistan ser bi wê împaratoriye bû û helbestvan û rewşenbîrên kurd gelek car li Stenbolê bûn. Bandora Stenbolê gelekî li ser helbestvan û rewşenbîrên kurd hebû ji bo rewşenbîrîkirina behremendên Kurdistan.

Bi taybetî li dû Bizava Meşrûtiyet (1908) ku helbestvanên wek Tewfîk Fîkret (Taqne, 2001, pp. 10-11), Cenab Şehabettîn (Ebdulhemîd, 1975, p. 50) ku wek helbestvanên nûxwazên tirk bandora wan gelekî li ser helbestvanên nûxwazên kurd wek Şêx Nûrî Şêx Salih, Goran û Reşîd Necîb hebû.

Herwiha di wê serdemê daçend kovar derdiçûn ku têda rewşenbîriya xwe belav dikirin, wek (Kovara Rojî Kurd 1913) (Xeznedar, 1981), (Kovara Jîn 1918-1919) (Boz arslan, 1918-1919), (Kovara Kurdistan 1919-1920) (Pîrbal, 1919-1920) ji bilî rojnameyên (Kurdistan 1989 – 1902) (Dr. Kemal Fuad, 1972) .

Kêm yan jî zêde bandora van hebû, lê (belam) li dû temambûna Cenga Yekem ya Cîhanî û derketina Şêx Mehmûd û hikûmeta wî li Silêmanî û derdora wê, rewşa rewşenbîrî, ramanî (fîkrî), ramiyarî û wêjeyî ya kurdî gelekî bervî pêşve bir û behremendên wê serdemê hatin qada pêşketinê û berhemên xwe yên bîrî (fîkrî) pêşkeş kirin.

Şêx Nûrî Şêx Salih, yek ji wan rewşenbîr, helbestvan û nivîskaran bû ku gelekî bi çalakî û şeweyekî xurt hat nava qada pêşketinê û bi avayekî berçav beşdarîya wî hebû di bizava rewşenbîriya wê serdemê.

Şêx Nûrî Şêx Salih wek rewşenbîrekî neteweyî bîkrawe agahdarê hemû bûyerên netewatî yên certibrrekanî serdema xwe bû, wek Şoreşa Şêx Se'îdê Pîran û Dersîm û Damerzan û hilweşîna Komara Kurdistan (Mehabad) û Şoreşên Barzan. Cih? vekir û ev hemû rewşa mijarî weke rewşa hêsinî ye ku şiyar û xurtbûna helbestvan bi xwe ye, ew helbestvanên nûxwaz bi hev du re çêkirine ku Şêx Nûrî Şêx Salih e û digel helbestvan û hevalên xwe yên wek Goran dikarî bû teknîkeke guhertî bida bizava helbesta kurdî di serdemeke bellî da ku serdema nûkirina helbesta kurdî ye di sed sala bîstan da.

Ewên ku zêdetir rewşenbîriya Şêx Nûrî û hevalên wî kûr kirine, derçûna wan rêze rojname û kovaran bû ku di serdema jîyana Şêx Nûrî da derdiçûn û bandor û karên wan yê yekser li ser rewşenbîran hebû, bi taybetî Şêx Nûrî ku pêwendîya wî ya xurt digel bizava rojnamegerîya wê demê hebû.

Hinek ji wan rojname û kovarên serdema Şêx Nûrî;(Bangî Heq-1923) (Salih, 2001.), (Pêşkewtin-1922) (Elî Nacî Kake Heme Emîn û Sîrwan Bekir Samî, 1998), (Bangî Kurdistan-1922) (13),(Rojî Kurdistan) (14), (Umêdî Îstîqlal-1924) (15), (Jîyan) (16), (Diyarî Kurdistan) (17).

Ew serdema ku Şêx Nûrî têda jîyaye, bi taybetî di dema Cenga Yekem ya Cîhanî û paş wê, Kurdistan bi giştî û Jêrî Kurdistan (başûr) bi taybetî di rewşeke abûrîya gelekî xerap da bû û gelê kurd ji ber hejarî, xizanî û derdan ketibûn delaletê.

Cotkarî bi amûrên seretayî (kevn, berayî-bi tirkî ilkel) dihate kirin ji ber wê gelek zevî nedihatî çandin û vala diman herwiha kêr (feyde) jê nedihat girtin, xwedîkirina pez û terş û ajalên din ji ber nebûna alif, êm û xizanîyê gelekî kêr bibû.

Bazirganî bi şeweyekî wiha nebû ku bibe hoya (sedema) vejîna aborîya Kurdistanê, bi kurtî Kurdistan di rewşeke aborîya xerap da dijîya û wê hejarî û nebûnê jî bandor li ser xwendin û rewşenbîrîyê dikir.

Şêx Nûrî yek ji wan helbestvanan bû ku udi temenê biçûkatîya xwe da (di temenê xwe yê 16 salîdaketibû pê nanê xwe) ('Ebdulwahid, 1985, p. 23).

1.2 Rewşenbîrîya Şêx Nûrî Şêx Salih

Şêx Nûrî wek helbestvanekî pêşeng û diyar yê bizava nûxwazîya helbesta kurdî xwedî rewşenbîrîyeke fireh bû, ew rewşenbîrîya alîkarek bû ji bo helbestên weke yên wî binirx derkevin holê. Çimkî behremendî tenê ji bo helbestan ne bes e, belkî behremendîya rewşenbîrîyê pêş dixê.

Şêx Nûrî hem di warê helbestê da behremend bû û hem jî di warê teorîyê da agahdarê heman (regez) û binemayên helbest û helbestên derdorê û cîhanê bû, ji ber wê di helbestên xwe da gelekî jîr û jêhatî bû û di helbestên wî da berçav dibûn.

1.3 Pileya Xwendinê

Şêx Nûrî Şêx Salih, di serî da ji bo xwendinê çû hucreyê û xwendina wî mellaletî bû, herwiha digel pirtûkên şer'î zimanê farisî û tirkî jî xwendîye. Paşê jî li Silêmanîyê çû

Dibistana Ruşdîye ya Leşkerî lê paşê dev jê berda. (Ebdulwahid, 1985, p. 99). Ji ber nebûna destkurtîyê bêçare ma ku piştî mirina bavê xwe cihê wî bigre ji bo kar û peydakirina nan di navbera ‘Êraq û Êranê da bazirganî kirîye, ew xwendina wî ya bilind hewqas belaş nebû.

Lê Şêx Nûrî ev kir kilîlek ji bo derîyê cîhana rewşenbîrîyê veke û sûdê ji zanyarî û rewşenbîrîya giştî û bi taybetî ji helbestê werbigre û bi wê kilîlê di dirêjahîya helbesta kurdî da werçerxanekê pêş bixe.

Şêx Nûrî gelekî baş bi zimanê farisî, tirkî û ‘erebî zanî bû û sûd ji çavkanîyên her sê zimanê cîranan werdigirt, bi rêya wan jî destî wî gihîşte wêjeya cîhanî. Bi xwe jî behsa radeya pisporîya xwe ya her sê zimanan dike û dibêje; ‘ez bi farisî, tirkî û ‘erebî baş zanim lê bi temamî nikarim bi ‘erebî bipeyivim’ (Ebdulwahid, 1985, p. 66), tenê wî bi xwe ne, belkî rewşenbîr, helbestvan û nadaranî? serdema wî jî şahîdîya wî kirine ku bi her sê zimanî zane. Wek Refîq Hîlmî ku dibêje: ‘wî di biçûkatîya xwe da xwe dabû helbest û wêjeyê, zimanê tirkî, farisî û ‘erebî fêr bû. (Refîq Hîlmî, 1988, p. 199).

Belgeya zanîna wan zimanan di nav berhemên wî da xuya ne (diyar dibe), wek bandora hebûna helbestên her sê netewe û wergêra hinek berhemên helbestî yên ji wan zimanana. Beşeke pirr (gelek) ya ji helbesta binavûdeng ya Êbdulheq Hemîd (Makber=Meqbere) (Ebdulwahid, Dîwana Şêx Nûrî Şêx Salih, Berga 1., Beşa 2., 1985., p. 72)(Tefekur ya Reçaî Ekrem Beg) (Ebdulwahid, Dîwana Şêx Nûrî Şêx Salih, Berga 1., Beşa 2., 1985., p. 199) û (Li Kurdistanê Giranî (Ebdulwahid, Dîwana Şêx Nûrî Şêx Salih, Berga 1., Beşa 2., 1985., p. 77)) ji tirkî wergêraye kurdî.

Herwiha helbestek (Aylya Ebu Masî) (Ebdulwahid, Dîwana Şêx Nûrî Şêx Salih, Berga 1., Beşa 2., 1985., p. 65)) kirîye kurdî digel helbestek (Eyil Barbud (Ru’h) (Ebdulwahid, Dîwana Şêx Nûrî Şêx Salih, Berga 1., Beşa 2., 1985., p. 68) û du çarîneyên (ruba’î) Xeyyam ku hatinekirin îngilîzî û ji îngilîzî jî hatiyekirin ‘erebî ev helbesta ji ‘erebî bi navê Jîyan kirîye kurdî. (Ebdulwahid, Dîwana Şêx Nûrî Şêx Salih, Berga 1., Beşa 2., 1985., p. 75).

Ji farisî jî ‘Şewêk=Şevêk’ û çarîneyên Xeyyam kirine kurdî. (Ebdulwahid, Dîwana Şêx Nûrî Şêx Salih, Berga 1., Beşa 2., 1985., pp. 81-91) dîyare eger kes pisporîya

wan ya baş di derbareyê zimanekî da nebe nikare tiştan ji wî zimanî wergêrîne ser zimanê xwe, ev derdixe ku Şêx Nûrî di van her sê zimanan da gelekî jîr û jêhatî bû.

Ji bilî wergêrana berhemên ev sê zimana jî Şêx Nûrî helbest jî bi zimanê farisî nivîsandîye ; ''(Îstîqbal û Xoş Amedî Bang Dirdistan)'' (Ebdulwahid, Dîwana Şêx Nûrî Şêx Salih, Berga 1., Beşa 2., 1985,, p. 93) û ''(Ay Şahî Destgîr) (Ebdulwahid, Dîwana Şêx Nûrî Şêx Salih, Berga 1., Beşa 2., 1985,, p. 94) ''(Waqtî Îrşad Est) (Ebdulwahid, Dîwana Şêx Nûrî Şêx Salih, Berga 1., Beşa 2., 1985,, p. 95) Herwiha di jimare 1 ya Bangî Kurdistan da gotarek bi farisî nivîsandîye ((5-6)).

1.4 Şêx Nûrî û Karê Rojnamegerî

Şêx Nûrî wek rewşenbîrekî serdema xwe agahdarê ew kovar û rojnameyan bû ku derçûn û paşê jî derfetek ji bo wî çêbû ku li Silêmanî rojname hate belavkirin ew jî bi belavkirina berhemên edebî û bi karkirina di wan kovar û rojnameyan da beşdarî çalakîyên vî warî bû.

1.4.1 Belavkirina Berhemên Xwe Di Rojname û Kovarên Wê Serdemê

Dema ku Mîcerson kontrola rêvebirîya karûbarê Silêmanî girt destê xwe, kete hewla (têkoşîna) handana (teşwîk) xwendevanîya kurdî , ew bi xwe jî pêşî kurdî fêr bibû. Di encama wan hewlên xwe da Rojnameya Pêşkewtin derxist ku 118 jimare jê derçû.

Mîcerson dixwast ku ew kesên kurdîzan, helbestvan û nivîskarên kurd yên wê serdemê li dor xwe û rojnameya xwe kom bike û hanê bide wan ku xwe ji bandora zimanê cîranan dûr bixin û bi kurdîya saf (petî) berhemana binivîsîn. Yek ji wan helbestvan û nivîskarên ku beşdarî nivîsên Pêşkewtin dibû, Şêx Nûrî Şêx Salih bû.

Rojnameya Pêşkewtin carê di jimareya 27 da pêşbirkek nivîsa kurdî ya petî da û paşê jî di jimareya 30 da sê behem belav kir ku xelata yekem, duyem û sêyem qezenc kirin.

Di wan berhemanan da Şêx Nûrî bi helbesta ''Cutuga Şitêkî Çak e'' (Elî Nacî Kake Heme Emîn 'Etar û Sîrwan Bekir Samî, 1998) xelata yekem wergirt (50 ruyê). Ev giringîdan e ji bo dewlemendkirina ferhenga nivîsandina wî ya kurdî, ji bilî vê nivîsê Şêx Nûrî çend berhemên din jî di vê rojnameyê da belav kirîye.

Ji kir (Sirîye' Xisran) di jimareya 12 an da belav kir ku ev helbesta heta radeyekê ji ber bilî Rojnameya Pêşkewtin, Şêx Nûrî di Rojnameya Jiyanewe (1924-1926) da jî komek berhem belav bandora helbestek Tofîq Fîkret nivîsandîye . (Taçane, 2001, pp. 10-11) Herwiha ji bilî helbesta "Hawarî Weten" jimare 14 û di serê jimareya 19 an da bi navê "Turk û Kurd-Gurg û Mer= Tirk û Kurd-Gur û Mîh" û gelek berhemên din belav kir.

1.4.2 Xebata Şêx Nûrî Di Rojnamegerîya Serdema Xwe da

Şêx Nûrî ji bilî rojnamegerîya serdema xwe da ku bi belavkirina berhemana beşdarî xebatên rojnamegerîyê bibû. Herwiha di serdema Şêx Mehmûd da jî weke endamekî serkan (sitaft) di rojname û kovaran da jî xebitîye.

Şêx Nûrî û Şêx Mehmûd mirovên (xizim) hev bûn, ji aliyê Behyexana Emînê 'Etarî ku xanima duyem ya Şêx. ('Ebdulwahid, Dîwana Şêx Nûrî Şêx Salih Beşa 1, 1985, p. 99) Wiha xuya dike ku ev bûye sedemek ku Şêx Nûrî di rojnamegerîya serdema Şêx Mehmûd da bixebite û berhemên ji çend mijarên cuda belav bike. Paş damezrandina Hikumeta Kurdistanê li Silêmanîyê bi serokatîya Şêx Mehmûd di Sermaweza 1922 û paş vegera Şêx ji Kîwêt, Rojnameya (Bangî Kurdistan) derxist. Ev rojnamey heftane bû û "sa'hib îmtîyaz û mudîr mesûl= xwedî takemaf û rêvebirê berpîrs" ê wê (Mistefî Paşa) bû û "(Mi'hrirê kurdî û farisî)" '(Elî Kemal û M. Nûrî) bûn (Cemal Xeznedar, 1974, p. 1). Wate (yanî) Şêx Nûrî bi hevkarîya digel 'Elî Kemal karûbarê beşa kurdî û farisî yê rojnameya xwe birêve birîye ku ev ji jimare (1) ta jimare (13) bi vî hawayî (şêwe) bû, lê di jimareya (14) an da navê "mihirê kurdî û farisî" li ser nema.

Ji bo jimareya (14) mihirê wê bû "Mistefa Şewqî" û rêvebir bû "Kerîm Rustem", wate Şêx Nûrî heta 13 jimareyên rojnameyê xebat kirîye û paşê ji wir qetyaye, di wan 13 jimaran da Şêx Nûrî ji bilî derbaskirina karûbarê nivîsê gelek berhemên xwe yê wek helbest û pexşan (nesir) belav kir wek; gotarek di derbarê "Pêwîstîya Zanist Ji Bo Pêşketina Gel" jimare 1 û "Makîneya Çapê" jimare 13...

Li dû Rojnameya Bangî Kurdistan, Rojnameya Rojî Kurdistan li Silêmanîyê derket ku yekem jimareya wê di 15 yê Berfanbara 1922 an da hatîye belavkirin û bi giştî 16 jimare derçû. Xwedî takemaf û rêvebirê berpîrs M. Nûrî bû û mihir jî 'Elî Kemal bû.

Ji bilî karûbarê rêvebirina rojnameyê Şêx Nûrî gelek berhemên xwe di vê rojnameyê da belav kir, sergotara jimare 1 û 2 wî bi xwe nivîsandîye. Herwiha ji bilî van hinek gotarên din jî di vê rojnameyê da belav kirîye wek; "Micadeley Heyat" jîmare 5, di heman jimareyê da helbesta "Eskerî" belav kirîye. "Wîlayetî Mûsil Le Lozan da" jimare 6, "Sîyasî" jimare 8, "Milt" jimare 14.

Şêx Nûrî di jimare 6 ya Rojî Kurdistan da bi navnîşana "Wîlayeta Mûsil Di Lozanê da" bi vî awayî helwesta xwe anîye ziman: "Wîlayetî Mûsil ke be a'tîbar 'imum kurdin be nawî mîletewe mudafe û ya xisbî em wîlayete bo çî literef aqwam sarewe taleb bîkrê." Îme xafil û 'atil û be weten û mulk xoman bigane tebî'î 'alimîş çawî le weten û mulkman birrîwe.

Heta diwênê me'zeretêkî welew welew nameqbûlîş bê boman feqet emro 'elî mella elnas xerîkî tesîs hikumetîn û xerîkîn le bînî aqwam da aşbat mewcudît bikîn. Nabî tore û biçuk beramber be 'hîquq meşru'e xoman ewende laqîd bîn.

Emro ke silh xerîkî teqereq mîletî kurdîş bo tesîsî hikumetêk legell Hikumetî Brîtanya da xerîkî muzakere ye, lazime em neqte' cîyatîyeye zor be wezû' hal û fesil bîkrê. Ta ku be xorayî tîfre nexewîn û telebe sêber û xeyalewe nenîn.

Em care le "Meclîs Luzan" umêd wa dikîn ke Kurdistanêkî mustaqîl le daxîl 'hidûdêkî coxrafî û tebî'î da boman teşkîl bika û hemû new'î 'hîquq meşru'e û 'heq meşru'e û 'heq hîyatîyeman bidatê. (Xeznedar, Rojî Kurdistan, 1973, p. 1) . Şêx Nûrî di ew berhemên xwe yên ku di *kovar* û rojnameyên wê serdemê da belav dikir, dîtin û ramanên xwe di derbarê mijarên rojane yên wê serdemê anîye ziman.

1.5 Şêx Nûrî û Hunera Stranan

Şêx Nûrî di warê berhemên wêjeyîyên din wek; nivîsên civakî, nîştîmanî, sîyasî, rexne û vekolînên wêjeyî da gelekî jîr û jêhatî bû, herwiha ji bilî van di warê awaz û stranan da jî gelekî xwedî şîyan bû. Di şevbêrk û rûniştînen heval û merivên xwe da gelek carî stran gotîye û gelek strannas û strarbêjên wê serdemê şahîdî ji bo wî da ne ku bi stranan zanîbû û dengê wî jî gelekî zelal û çêjek xweş û têr dida guhdaran.

"Şêx Nûrî li dû hev helbest xwendîye, bi dengê xwe yê xweş û me'hzûn û elemî dest pê kir zêdetir bi helbestên xwe ve ku ji bo cwanemergî birayê xwe Şêx 'Ezîz gotibe" (Azad 'Ebdulwahîd, 1985, pp. 128-147), wate ku ew helbestên dikir stran bi xwe dadanî. Lê tenê di şevbêrkên hevalên xwe da û li ser daxwaza hevalên xwe yên stranbêj stran gotîye. Husên Mezlûm bi "gwêndî rasteqîneye "danîye.

Şêx Nûrî li kîderê ba: Silêmanî, Hewlêr, Kerkuk. eger ku dema wî heba û derfetê jî rê bidayê stran digot. Hevaltîya wî digel dengxweş û stranbêjên serdema wî gelekî xurt û bihêz bû, wek; Husên Mezlûm, E'hey Bekir, Dîlan, Exol û Seyid 'Elî Esxerê Kurdistanî. Rojnameya Jîn di jimare 1384 da şahîdî ji bo wî daye ku dengê wî gelekî xweş bû. "Şêx Nûrî Şêx Salih ji bilî wê ku îro di hunera helbestê da paye bilinde, herwiha ku nika pîr bûye ji bo pîrî,

Helbestvana di bihara xortanîya xwe da dengxweşekî bê wêne bû. Helbestên xwe bi beste û helbestên Mewlewî bi qetar... Her ji xwe dihat.

1.6 Şêx Nûrî û Vekolîna Wêjeyî

Şêx Nûrî ji serî da bi zexîreyeke zanyarî ya wêjeyî ve hatîye nav qad û warê wêjeyê û di rojnameyan da xebitîye yan jî belav kirîye, ew zanyarîyên xwe bi gotarên sîyasî, rewşenbîrî û wêjeyî ve gihandîye xwendevanên xwe.

Yek ji ew karên pêşeng yên Şêx Nûrî belav kirîye gotareke bi navê " Wêjeya Kurdî" di Rojnameya Jîyan da ku di yekem rêzêya jimareya 20 a da nivîsîye û hemû li ser hev 25 rêzê ne. Di pêşgotina van gotarana da sedema nivîsandina gotarên xwe diyar dike ku ev in:

- i. Ji bo peyitandina (selmandin) hebûna ziman divê wêjeya wê Hebe û cûrê peyivîn û şeweyê nivîsandina her gelfî cuda ye û ji Bo berçavkirina vê jî pêwîstî bi "zanista wêjeyê" heye. Her Ji ber vê yekê ye ku Şêx Nûrî zane şarezabûna wêjenasîyê gelekî pir pêwîste ji bo peyitandina wêje û ziman.
- ii. Nebûna vê cûreya zanista wêjeyî (wêjenasî) di kurdî da.

iii. Şêx Nûrî bi xwe jî ji zaroktîya xwe da herdem bîr û ramana xwe tevî wêjeyê dikir.

1.6.1 Şêx Nûrî di gotarên xwe da behsa van mijarana dike

Huner û hunervanîya nefîse (mebesta wî zêdetir ji çend hunerên rewanbêjî ye) û di serî da ji bo rohnkirina (eşkerikirin)bandora wêjeyê digel muzîk, nîgar û endazyarîyê berhev (berawaird) dike ku ev hemû hestên taybet li ba bînde (bîner), bîzer (bîser) û guhdaran dicoşîne û hişyarkirinek ûcdanî li ba wan çê dikin.

Paşê dixwaze peyva ‘sen’et=huner’ bi wateya zimanvanî bi wateya têgihî (term, zarawe) rohn bike. Di encama şîroveyê da digêje wê encamê ku wateya têgihî ya ‘huner’ ji; ‘huner bi navgînîya taybet ya navtêdan (te’hrîk) û **tehîca** wê bedî’îyê ye k udi mirovan da heye.

Îjar wêjeyê dabeşî ser du cûreyê dike; devkî (şifahî) û nivîskî (ta’hrîrî). Paşê tê ser cûreyên wêjeyê û di mijara helbestê da yasayên taybet û giştî yên di navbera wêje û helbestê da diyar dike; "hemû helbest ji berhemên wêjeyê **me'dûd** e, lê hemû berhemên wêjeyî helbestî nîne belkî helbest jî şaxeke wêjeyê ye(Nûrî, 1927, p. 2).

Paşê wêjeyê bi jîrbêjî (mentîq) yê ve girê dideku wêje bê berçavkirina yasayên jîrbêjî sewgiran (desteber) nabe û îjar pêwendîya wêje, zanist û hunerê rohn dike.

Wêjeyê li rûyê dariştinê ve bi şeweyekî giştî dabeşî ser du cûreyê serekî dike: ‘nezm û nesir=helbest û pexşan(Nûrî, 1927, p. 3) û li dû vekolîna hêmanên (regez) helbestê da diçe û li ser kêş ûbeşavend (serwa) şîroveyan dike bi du cûre;(Wezna hîcaî, Wezna ‘erûzî).

Di wezna kîteyî da minakên kêşa ‘9 kîteyî’, ‘7 kîteyî’ û ‘16 kîteyî’ anîye. Behsa wê jî dike ku; " di wezna kîteyî da herdem mirov dikare ‘ededên kîteyên rêzikan bi **emust** bijmêre, ji ber vê yekê ji vê weznê re ‘wezna hesabî’ jî dibêjin(Nûrî, 1927, p. 3) .

Paşê jî behsa wezna ‘erûzî û binemayên kîteyên kurt û dirêj û remzê wan pêşkeş dike, îjar mînakên hinek be’hrên ‘erûzî tîne û digel tef’îleyên wan yên’erûzî praktîzeyê wan dike.

Navê ew be’hreyên ku me bas kir ev in,

- Remela heştî ya mehzûf (fa’latin fa’latin fa’latin fa’lin) × 2.
- Remela heştî ya mexbûna mehzûf (f’latin f’latin f’latin f’lin) × 2.

- Xefîfa şeşî ya mexbûna eslem (fa'latin mfa'lin f'lin) × 2.
- Hezeca heştî ya tamam (mefa'îln mefa'îln mefa'îln mefa'îln) × 2.
- Hezeca şeşî ya mehzûf (mefa'îln mefa'îln mef'ulin) × 2.
- Hezeca heştî ya exreba mekfufa mehzûf (mif'ul mefa'îl mefa'îl fe'ulin) × 2.
- Muzarî' ya heştî ya exreba mekfufa meqsûr (mif'ul fa'lat mefa'îl fa'lan) × 2.
- Receza heştî ya mexbûn (mefa'lin mefa'lin mefa'lin mefa'lin) × 2.
- Muctesa heştî ya mexbûn (mefa'lin f'latin mefa'lin f'latin) × 2. (Gerdî, 1999, p. 286).

Îjar bi hûrbînî behsa mustezad û kêşên wê û sedema bikaranîna wê kirîye, herwiha divê em wê jî bibêjin ku Şêx Nûrî bi tevgerên xwe jî wek helbestvanekî nûxwaz û bendşikên (azad) gelek huner di tazekirina mustezadda hewandîye (niwanduwe) û gelek helbest bi mustezada nû û cûr bi cûr nivîsandîye (Ebdulwahid, 1985, pp. 99-116). Îjardiçe ser “bingeh ji bo nivîsandinê” wate mercên nivîsandina baş ku wan jî dabeşî ser du beşan dike. Ewên pêş nivîsînê divê bête berçavkirin û ewên di dema nivîsandinê da jî divê bête berçavkirin bi wateyên wan datîne “wihdet , îcad , tertîb=yekîtî, vedozîn, rêzkirin” (Nûrî, 1927, p. 3) van hêmanana yek bi yek rohn dike.

Paşê Şêx Nûrî rêzêyek ji bo “uslub =şêwaz” veqetandîye û şêwaza nivîskar bi kesayetîya nivîskarve girê dide, “pêwendîya şêwazê bi kesayetîyê ve hewqas giring e çawa me got ; bê ku rûyê yara xwe bibînî lê bi meşa wê nas dikî, nivîsandin jî ku kesan gelekî xwendin li hemberê wê şêweyê wê ya taybet dinasî. Ji ber wê gotarek her **mihrrêkt** dî û bê wê ku îmza wî/wê bibînî yekser dinasî .

1.6.2 Paşê şêwazê dabeşî sê cûreyî dike

- Şêwaza Sade,
- Şêwaza Muzeyyen yan mutewesît,
- Şêwaza 'Alî .

Ev cûreya dabeşkirina şêwazê her di kevn da li Ewrûpa di sedsalên navîn da û li ba nivîskarên kevn yê ‘ereb serdest bû, diyare Şêx Nûrî di wan çavkanîyan da dîtîye. Lê her zû vê cûreya dabeşbûnê ret dike, çimkî li gor wî şêwaz pabendî mijar e û divê mijar bête dabeşkirin ne şêwaz. "Eger teqşîm (dabeşkirin) pêwîst bike: Giştî, taybetî. Ji ber wê ku di

têgiha wêjeyî da me navê mizyatman da bi vê qa'îdeyê şêwaza mizyatê jî pêwîste ku du nu'h be: Mizyata giştî, mizyata taybet(M. Nûrî ,. ., 1926, p. 1). Şêx Nûrî li dû şêwaz tê ser behsa rewanbêjî û hinek hunerên din ku pênasê û îzahata wan dike û mînakên helbestan jî bo wan tîne. We; te'qîd(Nûrî, Meneqehît, 1927, p. 1). û menqe'hîyet , (îcaz – aktar û 'hişu – atnab – 'hisin)(Nûrî, Meneqehît, 1927, p. 13).

Wekemînak di behsa menqe'hîyet da dibêje:" menqe'hîyet bi rutîfîya şêwaz alîn jî tiştên zêde. Ji bo tamîn menqe'hîyet du tişt pêwîste: Awl a awî ku em dinivîsîn û em di zîhnê xwe da t'înî bikin , tenê ewê ku em dinivîsîn li paş nivîsandinê kîjan hêla wê em bixwînin, agir mna'fî minqhît b'çê şit , heman tiştê bî lizum û klîmey zadî tya bu ewaney lî gî bkeyn " (Nûrî, Meneqehît, 1927, p. 51)

Her di derbarê vekolîneya wêjeyî û bi taybetî jî 'erûz û rewanbêjî da, destnivîseke din ya Şêx Nûrî heye bi nawî "صنعت و صناعی نفسیه".

Ev destnivîsa gelekî bi rêkûpêkî hatîye nivîsîn wek misude be wiha diyar e diyar nîye ku gelo ev ew heman destnûse ku demekê jî bo 'Elaeddîn Secadî şandîye jî bo ku ramana xwe ya li ser vê destnûsê bibêje yan jî bo tişteki din e.'Elaeddîn Secadî di derbarê destnivîsa wî dibêjele: "Demekê Şêx Nûrî lînûseke (defter) du sed rûpel jî min ra şand di derbarê 'erûz û rewanbêjî ku mînakên jî helbestên kurdî bûn ('Ebdulwahîd, 1985, p. 51).

1.7 Şêx Nûrî û Wergerrîn:

Wergerrîn alîyekî din yê çalakbûna Şêx Nûrî ye û ev jî nîşane û belgeya agahdarîya wî ya di derbarê wêjeya biyanî û firehbûna rewşenbîrîya wî ye.

Şêx Nûrî jî ber ku li hucre û medreseyên wê demê xwendîye her sê zimanê neteweyên cîran (farisî, tirkî, 'erebî) zanîbû û jî ber wê dixwast jî wan her sê zimanan berhemên wêjeyî wergerrîne ser zimanê kurdî û rewşenbîrîyên derveyî jî wan bigre.Herwiha jî wan her sê zimanan helbest wergerrandîye, wek helbestên Re'caî Zade Ekrem yê Tirk, du helbestên îngilîzî jî 'erebî , helbesteke Îlya Ebû Mazî yê 'ereb, helbesteke farisî û 28 çarîneyên Xeyyam (Ebdulwahîd, 1985, pp. 65-91).

Herwiha çend gotarên ku di rojanemeyên wê serdemê da hatine belavkirin jî wergerrandîye. Wekemînak; helbestek Îlya Ebû Mazî bi helbestî jî 'erebî wergerrandîye, wergerrîna wî bi kêş û beşavend e û di şêweya çend çarîneyan da ye. Di serî da dibêje:

Le kiwêwe? Bo çi amancêke ? Nazanim , keçî hatim

Keçawim kirdewe , rêm girte ber çeşnî xeyallatim

Ebînim rê û erom bo xom , eger dillxoş , eger matim

Le kiwêwe hatim ? û em rêgeye bo kiwê ye? Tênegem(Ebdulwahîd, 1985, pp. 65-66).

Kurdîya wê hemû 5 çarîne ye û nîvdêra wê ya çarem ya hemû çarîneyan bi “tênegem” diqedin.

1.8 Bizava Nûxwazîya Helbesta Kurdî:

Wek vetîreyeke (diyarde) dîrokî û civakî tu (hîç) guherîn ji xwe ber nayê holê (çê nabe). Di pêvajoya dîrokî da erka gelek sedemên mijarî û hêsinî (xudî) bi hevdu re heye di guhertinan da. Wek me di pêş da dît ku Şêx Nûrî Şêx Salih xwedî rewşenbîrîyeke baş bû, agahdarê rewşa sîyasî û civakîya kurd û cîranên kurdan bû û di heman demê da jî pispor û şarezayê wêje û helbesta kurd û cîranên kurdan bû.

Pisporîya wî yê di derbarê wêjeya kilasîkî ya kurdî da wiha kir ku xebat û hewlên wî resen bin û bi êşkere û şêweyekî berçav gavan bervî nûxwazîyê bavêje û sîmaya taybetî ya netewayetî wînda nebe. Di heman demê da jî bi rêya jîrî û pisporîya wî yê di derbarê wêjeya cîranan û neteweyên din jî wiha kir ku bi asoyeke berfirehtir biçe nav wêje, peyam û alîyê hunerên wêjeyê.

Çimkî bi hoya berhemên biyanî ve dikarî bû zanyarîyên gelek baş di derbarê wêje û zanista wêjeyê da kom bike.’ Şêx Nûrî Şêx Salih, ronakbîrekî mezin bû bi hoya zanîna zimanî tirkî, farisî û 'erebî pisporîya wî gelek di derbarê helbest û rexneya wêjeyî û hunerî da hebû. Alaya tazekirinê bilind kir û di vê pêvajoyê da Fayeq Tapo, Reşîd Necîb, 'Ebdulrehman Begî Nifûs û Goran jî bi wî ra bûn (Xoşnaw, 2002, p. 84).

Di vir da diyare ku ji bilî pisporîya wî ya di wêjeya kilasîkîya resen ya kurdî da, agahdarê wêjeya cîranan bû jî. Şêx Nûrî şîyana wî hebû û dikarî bû nîgekî wî li ser wan û nigê din jî li ser van be û bi wê pêgehê ve biçe nava cîhana wêjeyê û dahênana wêjeyî.

Li paş Cenga Yekem ya Cîhanî, rewşeke din li deverên Rojhilat û hemû cîhanê hat pêş. Wê cengê gelên li ser rûyê zevî wiha hejand û wiha li wan kir ku ser le nwê be xoyanda biçnewe , bi biha û nerîte deqgirtuwekanyanda biçinû be cûre, raman û dîtînen din ve li jîyan û pêşerojê binerin.

Loma di wêjeya kurdî û her sê neteweyên cîran da bizava nûxwazî dû cengê dest pê kir, lê çiqas di wêjeya farisî da gav avêtina bervî nûxwazî bi şêweyekî **şêneyî** bû jî li dû dest bikar bûna Reza Şa helbest heta demekê hewqas rewacê da nebû lê xebatên takekesî jî ji bo tazekirinê li vî alî û li wî alîyê serî hildan. Wekemînak Zebî'h Behrozî di bin bandora berhemên Şekspîr da şanogerîya mijarên taze belav dikir û (Mihemmed Meqdem) jî gelek helbestên xwedî mijarên taze çap kir (Xanlirî, 1241, p. 51).

Paşê gelek helbestvanên din yênc gênc derketin holê û berhemên xwe di kovar û rojnameyan da belav dikirin wek ; Nîma Yûşic, Dr. Mûhyeddîn Mîr Fexrayî, Siyawîş Kîsrayî, M. Umêd, Ferûx Ferûxzad, Mectebayî, Hesên Hunermendî û Ferîdûn Hişyarî (Xanlirî, 1241, p. 150).

Lê ewê ku di guherîna bizava nûxwazî da erka serekî dilîst Nîma Yûşic e ku qalibê kevn şikand û raman û dîtinên nû ve li helbest û helbestvana nihêrî û li ser wê binemayê jî xebatên xwe darêjand.

Di wêjeya tirkî da jî li paş Cenga Yekem hêdî hêdî helbestvan vegeryan ser wêjeya gel ku wek çavkanîyekê ji bo dewlemendkirina helbesta tirkî û parastina resenîya xwe ya li hember bandora wêjeya biyanî bi taybetî jî wêjeya ferensî. Ev qonaxa wate seretaya nûkirinê gelek car wek "Qonaxa Hilweşîn û Çêbûnê" tê naskirin ('Ebdulhemîd, 1975, p. 130).

Helbestvanên di navbera her du cengên cîhanî da ew guherînên mezin dîtin ku bi ser welatê wan û hemû cîhanê da hatîye, vê wiha li wan kir ku bi cûreyekî din bifikrin û binivîsin. Rûyê helbestên vê qonaxê bi pirranî li civak û gele û çavkanîya helbestan jî bi pirranî siruşt (xweza), jîyan û mirov e ('Ebdulhemîd, 1975, p. 131).

Hinek helbestvanên vê serdemê wek; Orhan Welî, Asaf Halet Çelebî û Necatî Cûmalî ye, lê ewê ku helbesta tirkî ya nû gihand qot (lûtke) û xwe û helbesta nû ya tirkî bi cîhanê da nasîn Nazim Hîkmet bû.

Nazim Hîkmet bi hezimirina çandê û bi vegera ser kêşa kîteyî (hîcayî) û wergirtina bîrûbawerîya pêşketinxwazîyê şoreşek di helbesta nû ya tirkî da çêkir. Di zimanê 'erebî da jî, li dû Cenga Yekem ya Cîhanî helbestvanên "Mehcer", "Koma Apollo" û helbestvanên "Dîwan" tiştên nû nivîsandin, lê bizava helbesta nû li ser destê Bedir Şakir

Siyab û Nazik El Milake destpêkir di sala 1948 an da (Melaîke, 1967, p. 89). Lê herî zêde xebat û berhemên Bedir Şakir Siyab di vê bizavê da berçav in.

Di wêjeya kurdî da jî, her li pêş Cenga Yekem 'Ebdulrehîm Rehmî Hekkarî (Bekir, 1999, p. 6) û paşê jî 'Ebdulrehman Begê Nifûs, Reşîd Necîb û îjar Şêx Nûrî Şêx Salih û Goran hatine meydanê û ji van erka ŞêxNûrî û Goran ji ya hemûyan diyartir bû.

Lê Goran nûkirina xwe ji ya Şêx Nûrî kûrtir û berfirehtir kir û bi dîtineke berfirehtir tiştan dibîne û hûrgilîya ya wî ya wêjeyî zêdetir e. Loma di vê bizavê da zêdetir navê Goran tê anîn û tê gotin, nexwe (egerna) Şêx Nûrî wek pisporekî zanista wêjeyî û helbestvanekî dahêner erkeke (roleke) bilind dilîst di vî warî da.

Şêx Nûrî di warê belavkirinên ew berhemên ku li ser wêjeyê şîrove dikin yan jî belavkirinên berhemên helbestî ji hevalên xwe yê serdema xwe çalaktir bû .Goran pêşengîya Şêx Nûrî dipesînîne (meth dike) û dibêje: "Şêx Nûrî, Reşîd Necîb û ez bi hevdu re em ji wêjeya tirkî bandordar bûn (bandora wêjeya tirkî li ser me hebû) û me bi hev du re dinivîsî, lê tenê Şêx Nûrî helbestên xwe belav dikir, min belav nekir û ji ber wê **neşatî** derket "(Bîmar, 1970, p. 3).

Paş vê Goran li ser neşat û derketina Şêx Nûrî ku wek serokê bizavê şîroveyan dike û seroktîya wî bi çend sedeman diyar dike: " lê dikare ji Şêx Nûrî re weregotin serok bi sedema

- Pirranîya berhemên wî,
 - Belavkirina berhemên wî bêguman bandoreke mezin dibexşîne ser wêjeya kurdî "
- " (Bîmar, 1970, p. 5).

Lê wiha dîyare ku ew serokatîya Şêx Nûrî her ji bo seretayê bizavê bû, Goran ba le rûy xakyeweş behsa vê nekirinbe çimkî her ew kes Goran bû ku giringî da wê bizavê û binemayên wê peyitand. Wiha dîyare ku şahîdîya Goran bû ku di derbarê erka Şêx Nûrî ji wan yê din ku behsa vî alî dikin bandordartir be, çimkî Goran û Şêx Nûrî di serdemekê da bi hev re jîyane, wate di serdemekê da helbest nivîsandine.

Her di derbarê nûkirina helbesta kurdî da Dr. 'Îzeddin dibêje: "Eger Şêx Nûrî yek ji ew helbestvanên ku pelî helbesta kurdî ji meyîna çend sedsal naverok û rûxsara helbesta klasîkî ve bervî guherîna romantîkî biri be, em di helbestên wî da jî hinek taybetmendîyên

romantîkîya kurdî dibînin ku ji xwe ve alîyê giştî yên romantîkîya cîhanî têdaye ku taybetîyek wê bi xwe heye û resenîya helbesta kurdî û ew rêbazên wêjeyî yên kurdî têda be (Resûl, 1990, p. 88).

Wek dîyare di vir da Dr. Îzeddîn, erka Şêx Nûrî bi wê dibîne ku helbesta kurdî jimeyîna pêş rizgar kirîye û şeweyekî nû dayê, herwiha di heman demê da jî danûsendin digel romantîkîyê da jî kirîye. We nebe di nav taybetîyên giştîyê wê rêbazê da xwe wenda kiri be, belkî bi taybetîyên kurdî yên wê rêbazê girtîye, wate taybetîya neteweyîya kurdî di helbestên xwe da parastîye û ji wê bingehe ve bervî dahênan û nûkirinê gav avêtîye.

Ji ber vê yekê wiha li wî hatîye ku morka resenîyê di helbestên xwe da biparêze. Refîq Hîlmî gelekî bi hûrgilî di gelek cî da helbestên Şêx Nûrî û erka wî ya di bizava nûxwazîyê da helsengandîye û bi ditîneke berfireh alîyê cudayên berhemên Şêx Nûrî xiste ber balkêşî û rexnegirtina xwe ya hûrgilîyê û dibêje: "Cihê înkariyê ye ku Nûrî helbestvanekî tecdîdperwer (nûxwaz) e, xelekeke ku evserî û ew serîyê çembera helbestvanên çerxa pêş xwe digel helbestvanên vê çerxê da anîye ser hev (Hîlmî, 1988, p. 205).

Di vir da Refîq Hîlmî cextê li ser du xalan dike (li ser du xalan radiweste) : yekem nûxwazîya helbestvan û duyem erka wî ya bi hev du re girêdana kevn û nû û erka wî ya veguhestina helbestan ji qonaxa pêşî ku bi komek destûr û yasayên hişk girêdayî ne ji bo qonaxa nû ku azadîyeke zêde daye berdestê helbestvanan û bikaranîna hunerên helbesta kurdî " wezin, qafîye, şêwe, ahenga û rêyek nû danîye ji bo helbesta kurdî. Ji ber vê yekê Şêx Nûrî demekê li Silêmanîyê bû serokê helbestvanên gênc û geleka ji wan dewê (tenanet) Goran jî hewla zarîkirina (lasayîkirdnewe) Şêx Nûrî dane (Hîlmî, 1988, p. 200).

Refîq Hîlmî jî wek Goran, Şêx Nûrî serkirde û pêşengê nûkirina helbesta kurdî qebûl dike, Refîq Hîlmî vê dîtina xwe ya di derbarê Şêx Nûrî da li cihêkî din jî dúbare kirîye û dibêje: " Ji bo demeke kurt bû **ze'îmê** înqîlaba helbesta kurdî li devera Silêmanî (Hîlmî, 1988, p. 206).

Di vir da her çiqas heman erkê ji bo pêşengî û serkirdeyî ya Şêx Nûrî dibêje lê wek "demeke kurt" behs kirîye ku ev jî digel wê rastîyê ye Goran paşê rişmeya (cilew) wê nûkirinê girte destê xwe bi çalakî û hûrbînîyeke xurttir bizava xwe bervî pêş bir.

'Elaeddîn Secadî wek vekolîner û pêşengê wêjeya kurdî di hewsengandina rêyên nûkirina helbesta kurdî û erka Şêx Nûrî di wê nûkirinê da dibêje: "Yekê ji wan kesana ku hewqas ev rêyana girt Şêx Nûrî Şêx Salih bû . Ev helbestên wiha rê dide (pîşan dide) ku ji şoreşgerîya wêjeya kurdî seretayê vê sedsala bîsta ye(Eladdîn Secadî, 1968, p. 314).

Seretaya destpêkirina Şêx Nûrî ji bo nûkirina helbesta kurdî bi zarîkirina helbesta tirkî dest pê dike. Kakey Felah dibêje: " Di wê serdemê da gava yekem di wî warî da zarîkirina helbesta nû ya tirkî bû.. Şêx Nûrî Şêx Salih jî, ji ber wê ku bi temen ji Goran mezintir e û digel jîyana rojnamegerîya kurdî ya wê demê jî pêwendîya wî ya yekser di warê rojnameyan da hebû, berhemên xwe zêdetir belav dikir.

Ew û hewa wî ya wêjeyî jî baştir bû, loma di wê serdemê da gava yekemîn ya guherîn û pêşveçûn zêdetir bervî helbestên tirkî bûn û xebatên wêjeyî yên Şêx Nûrî zêdetir berçav bûn û ew ji hewtewanêxwe zêdetir dihate dîtin(Felah, 1978, p. 29).

'Umer Me'ruf Berzincî jî li ser wê rawestyaye ku Şêx Nûrî di qonaxa sereta da ketibû jêr bandora helbestên tirkî . 'Erka bilind ya Şêx Nûrî hebû di vê tevgerê da. Di serî da wek helbestvanên nûxwazên tirk tevgerîya û paş demekê jî mil bi mil bi wan re gav avêt û ji wan derbas jî kir û bi zarîkirina wan jî ranewestîya (nehat ser)(Berzincî, 1978, p. 35).

Lê radeya vê bandordarbûna Şêx Nûrî bi helbestvanên tirk, bi taybetî di qonaxa seretayî ya destpêkirina bi nivîsandina helbestan, li ba Ehmed Taqane bi rohntir derdikeve ku hinek helbestên Şêx Nûrî digel helbestên Tofîq Fîkret berawird dike (muqayese dike) û derdixe ku wî çend helbestên Şêx Nûrî anîye ku di bin bandora helbestên Tofîq Fîkret nenivîsandîye ku wergerrîna helbestên wî ne û yekser kirine kurdî.

Bi wî avayî ku Şêx Nûrî bi xwe yek du dêr têda li ser heman ramana wî zêde kirîye, radeya pisporîya Şêx Nûrî di helbest û wêjeya tirkî û radeya bandordarbûna wî ya bi helbestên tirkî li ba gelek vekolînerên kurd hatîye destnîşankirin.

Lê ji hemûyan zêdetir Ehmed Taqane yê tirkîzan bi vekolînên kûr û hûrbînî ve wê rastîyê sax dike ku bandordarbûna Şêx Nûrî bi helbestên tirkî û bi taybetî bi helbestên Tofîq Fîkret gihîştîye radeya wergerrînê û hinek mînakên bi wê cûreyê wergerrandîye destnîşan kirîye ku Şêx Nûrî bi xwe di tu cîh da ew rastîya xwe dîyar nekirîye.

Ehmed Taqane dibêje: " Di nav helbestên Şêx Nûrî da çar helbest ketiye berdestê me ku ne her helbestên Tofîq Fîkret bandor lê kirîye, belkî digêje radeya guherîna deq bi deq ku gelek alîyên jê girtinê têda dîyar e"(Ehmed Taqane, 2001, p. 25).

Ew çar helbestên ku Ehmed Taqane destnîşan kirîye û berawird kirîye û radeya wan yê lihevçûn û cuda pêşî me daye ev in: "Rexne Li Xwe û Skala, Jîyana Ademîzad, Îstîqbal Ji Bo Yên Nû Gihîştî, Nîsan".

Ehmed Taqane amajeyê ji bo wê jî dike ku ŞêxNûrî jî di hinek cî da her heman peyvên "Tofîq Fîkret" dúbare kirîye ku hewqasî di wêjeya Osmanî da li kar û gelek peyvên klasîkîyan jî her weke xwe danîne (nivîsandine) (Ehmed Taqane, 2001, p. 28).

Bikaranîna peyvên vê cûreyê û hevbeş di serdemeke diyarkirî da ji alîyê helbestvanên qonaxa veguhastinê ve gelekî li kar bûn, wek ; "naîl, ewc , sen'et , fikrî minewer, ro'h, esrar, xusran , îstîqbal, 'hesret melal, îfna". Ev peyvana çiqasî ji 'esil da peyvên 'erebî bin jî lê di nav wêjeya neteweyên ser bi Împaratorîya Osmanî da bûn bikar dihatin û cûreyê zimanekî wêjeyî çêbû ku jê ra digotin "Zimanê Wêjeya Osmanî" û ji wê zêdetir ferhengek jî heye bi navê "Qamus El Luxe El 'Utmanîye=Ferhenga Zimanê Osmanî(Mihemmed Elensî, 1318).

Nivîsên ew peyvên tirkî, farisî û 'erebî têda hatine ku di wêjeya ev her sê zimanan da hewqas gelek dúbare bûne.

Raste di van çend helbestan da Şêx Nûrî heta radeya wergerrînê ketîye jêr bandora Tofîq Fîkret, lê di helbestên xwe yên din da, eger paşê dernekeve ku ew jî heta radeya werrgerînê ketibin jêr bandora helbestvanên tirk, ji ber ku dahênana wî heye û cihê taybet ya nûkirinê û bandora wî hebû.

Dr. Kamîl Besîr jî di wê vekolîna xwe ya di derbarê gotarên rexneyî yên Şêx Nûrî da nivîsandîye û dibêje: "Şêx Nûrî Şêx Salih ku bi serokê tazekirina helbesta kurdî tê naskirin, ji tu (hîç) çavkanîyeke bêgane bi giştî û tirkî bi taybetî kereseyên (materyalên) belavkirina bizava xwe bi pençikan neanîye(Dr. Kamîl Besîr, 1980, p. 84).

Lê ew mînakên li ba Ehmed Taqane û agahdarîya pisporên wek Refîq Hîlmî ku destnîşana bandora helbesta tirkî li ser Şêx Nûrî dikin, vê ramanê hildiweşîne. Bêguman agahda bûn û ketina ber bandora wêjeya bîyanî ji bo çêkirina helbestên nû di wêjeya

netewayetî da ne ji bo her tişteki mezhûr (xewş) belkî nîşaneyê zindîbûna wê wêjeyê ye ku bi wê mercê negêje wergerrîna yekser wek ew çend helbestên Şêx Nûrî bi mînak hatine.

Dr. 'Îzeddîn Mistefa Resûl dû hêlengandina ramana Refîq Hîlmî û Secadî di derbarê Şêx Nûrî da û dû kontrolkirina helbestên wî digêje çend encaman ku kurteya wan ev e

- Şêx Nûrî nûxwaze û kevirê hîma rêbaza helbesta nû danîye,
- Hîn jî helbestvanên nika nikarîn vê nûxwazîyê deynin,
- Ev nûxwazîya bi nûxwazîya helbesta tirkî û berhemên Tofîq Fîkret ve girêdayî ye, lê digel vê da jî Şêx Nûrî afirîner e ne zarveker e,
- Berhemên nû yê Şêx Nûrî xelekeke di navbera kevn û dû xwe da (Dr. 'Îzeddîn Mistefa Resûl, 1989, p. 82).

Bi vê ve dîyare Şêx Nûrî wek rewşenbîrekî pîspor û wek agahdarekî zanista wêjeyê û zimanzan û agahdarekî wêjeya cîranan digel hevalên xwe seretaya nûkirinekê di helbesta kurdî da anî holê û di demeke dîyarîkirî da (navbera her du cengên cîhanî) dest bi nûxwazîyê kir û pêşve bir.

2. NÛXWAZÎ DI RUXSARA HELBESTÊN ŞÊX NÛRÎ DA

Pêwîstîya her bizava nûkirin ya wêjeyî bi hewl û werzîmendîyeke (teqella, qîret) xurt û maweyeke (dem) dirêj heye, xwe mîsoger dike û cihê xwe vedike, çimkî pêwîstîya rêçik kişandinê (Plan û nexşe) bi azdaya bîr û şîyana dahênanê û zatkirina çûyina qadê(derketina holê) heye.

Tiştên nû rastî nerazîbûna tiştên kevn tên ku hewlê dide ji hemû alî da dorpêş (gemaro) bike û di serî da nehêle tevbigere. Lê bi hewl û koşîşa (xebat, têkoşan) berdewam û bi canekî xurt kûrbûnê ve tiştên nû dema tê hêz û gurbûna wê zêdetir dibe û reh û rîşeya xwe belav dike û wiha dibe ku bi ser destûrên kevn da serdest dibe.

2.1 Li gor ‘Ebdurezaq Bîmar nûxwazî bi sê gavan da derbas dibe

Gava Yekem: Tecrube ye, di vê gavê da helbestvan bi zarîkirina (lasayîkirdnewe) wêjeya hevçerx û wêjeya berî (pêş) xwe û di encama hewl û xemxurîya nûxwazîya xwe da, di tecrubeyeke her hawî (heme çêşn) da diçe, dibe ku serkeftî nebe û dibe jî serkeftî be.

Gava Duyem: Reşnivîs (reng riştin, taslak). Di vir da dibe ku helbestvan ji bo şêweyeke nû têxe rû reşnivîsekê çêbike (taslaqekê amade bike).

Gava Sêyem: Peyitandin e (çespan) ku helbestvan dikare li rûyê rastgoyî, behredarî, rewşenbîrî û resenîyê ve xwe bipeyitîne û çend mînakan berhem bîne (dirust bike) ku reng û şêweyên nemirî têda xuya bikin (Bîmar E. , 1979, pp. 44-45). Vê bizava nûxwazîyê di serê sedsala bîstan da di helbesta kurdî da serî hilda (derket holê) û li ser destê komê helbestvanên nasyar (naskirî) yê wê serdemê dest pê kir û hêdî hêdî giringîya wê xuya bû.

Şêx Nûrî û hevalên wî di wan gavana da derbas bûn şîyana wan hebû ji ezmûn û taqîkirinan derçûn û dixwastin bervî reşnivîsê biçin û îjar jî xwe bipeyitînin (xwe biçespînin, xwe bidin qebûlkirin).

Ji bo vê jî ezmûna xwe ji rehma helbesta klasîkî û bi bandora derve çû zerey der kir, "dibe ku Şêx Nûrî wek helbestvanên din yê wê serdemê lekanî sermîyana helbesta klasîkî hêmanên derbirîne wergirti be û di serî da bi berdewamîya wê rêbazê (dibistanê) dest pê kiri be. Lê di serê temenê afirandinê da hêmanên nûxwazî û nûkirinê xuya dikin û hinek derbirînen klasîkî heta roja dawî ya afirandinê jî digel wî da berdewam bûn û hinek car jî serdest bûn " (Resûl, Wêjeya Nû ya Kurdî,, Hewlêr, p. 83).

Di vê bizavê da erk û bandora Şêx Nûrî gelek taybete û xuya kirîye (diyar bûye), bi vê erk û bandora xwe jî ji hevalên xwe yê nûxwaz cuda bû, çimkî wek Goran dibêje; 'gelek berhem belav kirîye' (Bîmar ' . , 1970, p. 3).

Çimkî bi xwe di nav cerga bizava rewşenbîrî û sîyasî ya wê serdemê da bû, bi helbest û gotaran beşdarî pirsgirêken sîyasî û fikrî yê wê serdemê dibû. Cudahîyeke din ya giring ya Şêx Nûrî ji hevalên xwe ew bû ku rewşenbîrîyeke wî ya rexnegîrî hebû, di warê teorîya rexneyî ya wêjeyî da gelekî pispor û şareza bû û berhem jî belav dikir.

Di helbestên wî da gelek car olana (dengvedan, rengdanewe) ramana bîrdozan xuya dike, wek di vê vekolîne da hatîye destnîşankirin; di sala 1926 a di Rojnameya Jîyan da rêzek gotarên rexneyî bi navê 'Edebîyat Kurdî' (Wêjeya Kurdî) belav dikir.

Her çi qas bîr û ramanên wî di bin bandora gelek rexnegirên kevn da bû jî, lê gelek tiştên nû jî têda hebûn wek ; mijara kêş û mustezadê...Hwd. Di vê rêze gotarên wî da hevsengîya di navbera bîr û ramanên rexneyî, dahênan û tazekirina helbestên wî xuya ye."Şêx Nûrî helbesta kurdî li ber tîrêja (tîşk) teorîya rexnesazî ya taybet bi xwe xist ser rewta (meyil) tazekirin û nûxwazîyê, loma talîya (encam) vê rewte hûnandina helbestan bû ne ji bo helbestan belkî ji bo gel bû "(Besîr, 1980, p. 66).

Wate (yanî) erk û bandora Şêx Nûrî erkeke bingehîn bû. Refîq Hîlmî paş wê destnîşana bandordarbûna Şêx Nûrî ji wêjeya tirkî dike, bi taybetî jî bandoradarbûna wî ji Tofîq Fîkret û tilîya xwe bervî wê erkê dirêj dike û dibêje: "Ewên ku îro xwe wek sazkerên rêbaza helbesta nû dihejmêrin divê ew bizanibin ku yekem kevirê bingeha rêbaza wan ji alîyê Şêx Nûrî ve hatiye danîn" (Hîlmî, Şîr û Edebyatî Kurdî, 1988, p. 209)

Her wek Refîq Hîlmî amaje bi wê daye ku Şêx Nûrî her çiqas hinek car heta radeya wergerrînê dikeve bin bandora helbestvanên tirk û bi taybetî jî Tofîq Fîkret, wek Ehmed Taqane jî behs kirîye (Taqane, Tofîk Fîkret û Helbestvanên Nûxwazên Kurd, 2001, pp. 25-42), digel vê da jî "Şêx Nûrî tazekar e û kevirê bingeha rêbazê danîye" (Resûl, Wêjeya Nû ya Kurdî, 1989, p. 82).

Ev tazekirina Şêx Nûrî û hevalên wî mil bi milê alîyê naverok û mijarên helbestî ve wek di beşa pêşî da me hewl da em rohn bikin ku gelek alîyê ruxsara helbestê jî têda heye. Nûkirina wî hinek car biçûk be jî lê ev sereta ye (destpêk e) û serata jî bi tiştên kêr û biçûk ve dest pê dike.

Eger em bi çavekî hûrbînî temaşeya helbestên Şêx Nûrî bikin, em dibînin ku tazekirina wî ji hinek sîmayên helbesta taze wek ; kêş û beşavenda (serwa, qafîye) wêneyê helbestî û zimanê helbestî ne. Ev hêmanana (regezekan) bi ser hev da ramanekê di derbarê erka Şêx Nûrî da dide me di warê tazekirina ruxsara helbestê da.

2.2 Hinek Hunerên Helbestî:

Şêx Nûrî nûkirin (tazekirin) di hinek hunerên helbestî da kirîye û hinek huner jî cara yekem anîye nav helbesta kurdî. Di xezel û qesîde da ku du hunerên gelekî serdest û belavin di helbesta rojhilat da, Şêx Nûrî hewl dida ku ji hinek alîyê destûrên peyîtî yên xezel û qesîdeyan derbiçe û cûreyên azad di xezel û xesîdeyan da bikar bîne.

Wek serdaçûn (ladan) ji yekitîya beşavend (serwa) û peyrewkirina (bikaranîn, qebûlkirin) beşavendên mesnewî di hinek helbestên xwe da ku bi kêşa ‘erûzî hati bûn nivîsandin wek helbesta "12 ê Temûza 1958"(Azad 'Ebdulwahid, 1989., p. 309) ku ev di helbestên klasîkî da nehatîye peyrewkirin.

Ev vetîreya (dîyarde) li alîyê hinek hevalên Şêx Nûrî jî xuya dike bi taybetî ‘Evdirrehmanê Begê Nifûs(Mihemmed, 1989, p. 310).Alîyekî din yê nûkirina qesîdeyan li ba Şêx Nûrî ew e ku dabeşkirina qesîdeyên dirêje ji bo çend beşan ku ev jî helbestên ‘‘Stanza’’ yên Ewrûpî ne û bi rêya helbestvanên tirk Şêx Nûrî peyrewa van helbestana kirîye. Herwek di wergerrîna helbesta ‘‘Meqbere’’ ya ‘Ebdulheq Hamîd, diyare ku helbestek dût û dirêj ya stanzayî ye û Şêx Nûrî çend stanzayek jê kirîye kurdî ('Ebdalwahid, 1985, p. 45).

Herwiha wergerrîna helbesta ‘‘Tefekkur’’ ya Recayîzade Mahmût Ekrem bi giştî çar stanzaye('Ebdalwahid, 1985, p. 72), ev helbesta parçedar e diyare cûreyên wê gelekî lê yên giring du cûre ne:

- Wiha dibe ku hemû parçeyên wê wekhev dirêj bin, wek helbestên çarîn, pêncîn û şeşîn.
- Wiha dibe ku hemû parçeyên wê wekhev dirêj nebin, kurtî û dirêjîya wan cuda bin wek helbesta ‘‘Bo Mêjû=Ji Bo Dîrokê’’ ('Ebdalwahid, 1985, p. 72) ku donzde parçe ye û parçeyên jimareya dêrên wê cuda ne ('Ebdalwahid, 1985, p. 335). Herwiha helbesta ‘‘Pepûle= Pinpinîk’’ (Gerdî, Serwa, 1999, p. 286).

jî çend parçeyên cuda cuda ne di dirêjîyê da. Ji bilî van peyvên helbestî û zimanê helbestî jî di xezel û qesîdeyan da hatine guherîn ku paşê emê bi dirêjî vekolîna wan bikin. Di ser van nûkirinan jî Şêx Nûrî guherîn di hinek destûrên

klasîkî yên hinek hunerên helbestî da kirîye, emê di vir da li ser hinek alîyê nûkirina van huneran rawestin.

2.2.1 Mustezad

Hunereke helbestî ye ku ji wê helbestê ra dibêjin li dû her nîvdêr yan çend nîvdêr, parçeyek yan çend parçeyên yekîş û beşavendên taybetî ji bo wan tê zêdekirin (Hejar, 1361, p. 530).

Mustezad hunereke gelekî kevne, kevntirîn mustezada ku ji alîyê helbestvanên kurd ve hatibe nivîsandin helbesta Cizîrî (1570-1640) ye (Gerdî, Serwa, 1999, p. 286), lê bi ‘erebî nivîsandîye.

Li dû wî hinek helbestvanên din yên kurd mustezadên kurdî nivîsandine wek ; Ehmedê Xanî (1650-1707), Pertew Begê Hekarî (1777-1841), Nalî (1800-1865) û ‘Hemdî (1876-1936) ye (Bekir, Sîmayên ‘Erûza Qonaxa Veguhestina Helbesta Kurdî, 1998, p. 7).

Destûra taybet ya mustezada klasîkî heye li rûyê zêdekirina parçe, kêş û beşavendan ve. Şêx Nûrî bi teorî di rêze gotarên xwe yên rexneyî da bala xwe daye ser mustezadê û bi xwe jî çend mustezadên cûr bi cûr nivîsandîye û gelek cih (cî) da ji destûrên mustezada klasîkî derçûye derketîye (Nûrî, Edebyat Kurdî, 1926, p. 1).

Şêx Nûrî di derbarê sîstema mustezad û şêweyê zêdekirina parçeyan da dibêje: "Beyn beyn (car car) di hinek cihê weznên wan da, ji heman wezin hinek şikil tene zêdekirin (Nûrî, Edebyat Kurdî, 1926, p. 1).

Di mustezada klasîkî da dû (paş, pişt) her nîvdêran parçeyek tê zêdekirin, di vir da ew bi teorî ve dibêje ; ‘‘beyn beyn le be’zê cêga da=car car di hinek cî da’’ wate (yanî) peyrewa destûra wê nekirîye, di nivîsandina mustezad da jî her li pê vê gotina xwe çûye.

Îjar hoya (sedem) nivîsandina mustezad û zêdekirina parçeyan bi wê ve girê dide ku heta helbesta wî "le ber yek neseqî kelal awer nebê " (Ebdalwahid, 1985, p. 292). Wate ji bo ku bêzarîyê çê neke (bêhtengîyê neyne holê).

Tazekirina Şêx Nûrî Di Derbarê Mustezad da Di Van Xalan da Derdikeve

- Li rûyê kêş Şêx Nûrî tenê kêşa ‘erûzî ji bo mustezadê bikarneanîye, belkî li pişt vê kêşa xwemalî jî bikaranîye wek di helbesta ‘‘Dewrî Boten’’da (‘Ebdalwahid, 1985, p. 292) diyare ku bi kêşa xwemalî ya ‘‘de’’ kîteya ‘‘pênc+pênc=5+5’’ hatîye nivîsandin û kêşa parçeya wê ya zêde jî ‘‘pênc kîte’’ ye. Wek saxkarîyê bi navnîşana ‘‘Şî’rêkî Natewaw=Helbesteke Netemam’’ ji bo vê mustezadê danîye û di xaneyê mustezadên xwe da daneanîye (nedanîye).

Li gor dîtina wî di derbarê vê helbesta netemam da li jêrenotê (perawêz) dibêje: "Em helbesta Şêx Nûrî helbesteke netemam e û bi reşnivîs û perragendeyî min di nav destnivîsên Komeleya Zanyarî ya ‘Êraqê- Desteya Kurd da dît ku di dema xwe da pêşkeşî wan kirîye. Min çiqasî bala xwe dayê jî, nivîsandina vê nusxeya reşnivîsa min ji nenivîsandinê baştir zanî " (‘Ebdalwahid, 1985, p. 296).

Dibe ku di saxkirina dîwana wî da ku ev helbesta wek helbesteke netemam danîye û wiha dîbîne ku ev ne mustezad e, dibe ku bi kêşa xwemalî hatibe nivîsandin.

Ev ne netemamî ye, belkî ji bo wê serdemê cûreyeke ji bo tazekirinê ku sûdwegirtina ji kêşa kîteyî ya xwemalî ye.

- Li rûyê zêdekirina parçeyan, mustezada klasîkî li dû her nîvdêran parçeyek tê zêdekirin wek; li alîyê Xanî, Pertew Begê Hekarî, Nalî û ‘Hemdî dîyare ku me berê behsa wan kiri bû, lê li ba Şêx Nûrî ew destûrana namînin. Lê wek bi xwe dibêje: "Beyn beyn di hinek cî da parçeyek tê zêdekirin’’ Nûkirina Şêx Nûrî Li Vî Rûyê ve Di Wê da Derdikeve Ku:-

Hinek car li dû yek dêr, ne nîvdêrê parçeyek tê zêdekirin wek mustezada ‘‘Be Min Billê Çi Mîlletê= Ji Min Re Bibêje Çi Milletê’’ (‘Ebdalwahid, 1985, p. 99) û ‘‘Le Şêx Nûrîyewe Bo Zêwer= Ji Şêx Nûrî Bo Zêwer’’ (‘Ebdalwahid, 1985, p. 103) û ‘‘Min û Gelawêj’’ (‘Ebdalwahid, 1985, p. 109). Wekemînak di mustezada ‘‘Le Şêx Nûrîyewe Bo Zêwer’’ da dibêje:

Ey badî seba! Peykî xeyalatî edebîyan

Ey mîrweheyî fênîkî zamî dillê sûtaw

Ey badî xerman ('Ebdalwahid, 1985, p. 103).

Hinek car li dû çar nîvdêr (dudêr) ku hemû nîvdêr hevbeşavandin, yek parçe dike wek mustezadên ‘‘Esker’’ ('Ebdalwahid, 1985, p. 100), ‘‘Be Munasebetî Tebdîlî Nawî Jiyanewe–Bo–Jiyan’’ ('Ebdalwahid, 1985, p. 107) û ‘‘Rutbey Ezemet’’ ('Ebdalwahid, 1985, p. 111).

Wekemînak di mustezada ‘‘Esker’’ da ku bi xwe jî di behsa mustezad da wek mînakê anîye dibêje:

Sef sef ke dên û têdeperrin çist û ba û îqar
Mazî le sidîqî ewe, ebînim eka fîrar
Subhêkî pak û bê xeş ebînim wekû behar
Musteqbelêkî bê leke, pîrr keyf û neşedar

Bê toz û bê xubar ('Ebdalwahid, 1985, p. 100).

- Li rûyê pêwendîya beşavenda helbesta wî ya ‘eslî û parçeyên zêde, hinek tazekirin xuya dikin wek:

Hinek car parçe hemû li ser yek beşavend (serwa) dibin û peywendîya beşavendan bi nîvdêran re tuneke (nîye).

Wek di cihekî helbesta ‘‘Be Min Billê Çi Mîlletê’’ da ('Ebdalwahid, 1985, p. 99) dibêje:

Le kuspî rêge sill meke birro berew şeqamî jîn
Legel sebatî kurdewarî pêçewaneye bezîn

Xudaş lew hewlle awirî edatewe ('Ebdalwahid, 1985, p. 99).

Dengên beşavenda parçeyê wê ya zêde ‘‘atewe’’ye... Tu (hîç) pêwendîya vê bi beşavenda mesnewî ya dêra pêş ve tuneke, lê di giştîya helbestê da hemû

parçeyên zêde her ew beşavendên wê hene ku di van peyva da derdikevin: “heyatewe, nedayewe, wilatewe, edatewe, ebatewe, edatewe”.

Hinek car parçeyê zêde digel hev bi hemû beşên pêş hevbeşavend dibin, wek mustezada “Esker” (Ebdalwahid, 1985, p. 100) û “Rutbey Ezemet” (Ebdalwahid, 1985, p. 111).

Rutbey ezemet layiqî zatêke bizanê
Wek xoşî dezanê û bizanê ke dezanê
Nek layiqî şexsêke nezanê û nezanê
Nazanê eme xoşe belay xelqî cîhanê

Bêsûdû ziyân (Ebdalwahid, 1985, p. 111)

Di hemû parçeyên din da jî bi vê cûreyê (haweyî, avayî) beşavenda parçeyê wê ya zêde wek beşavenda çar nivdêra wê ya pêş e.

2.2.2 Operêt

Peyva “operêt” (operetta) peyveke îtalî ye biçûkkirina peyva “opera”ye, wate operay biçûk.

Hunereke helbestî ye û di nav da muzîk digel wê da lê dikeve, bi livandina dev û tevgerên bilez ve tê pêşkeşkirin”, di her gavê da muzîk digel da bikar tê û gotegot (gotûbêj, guftugo) têda heye û pirranîya mijarên wê tinazî (daşorîn, hîcîw) ne ” (Ebdalwahid, 1985, p. 16).

Operêt hunereke Ewropî ye û pêş Şêx Nûrî ji aliyê tu helbestavnên kurd neketîye berçavan. Operêteke Şêx Nûrî heye bi navê “Dilaweran” (Ebdalwahid, 1985, p. 16), ev operêta nivîsandin û dahênana wî bi xwe ye, yan wergirtîye û darêjandîye û kincên kurdî lê kirîye. Ev mijara gengeşîyê ye (munaqaşa), ev operêta di Dîwana Bêxud da jî hatîye belavkirin.

Di jêrenota (perawêz) helbesta wî da ev rohnkirina ji bo wê kirîye; “Kak Mistefa S’ab di derbarê vê bûyerê da ji bo Kak ‘Ebdulrehman Miftî nivîsandîye û dibêje: Di sala 1922 da em li Kerkûkê xwendekar bûn, spêdeyan (beyanî) me stranên tirkî distira. Min

bihîst ku cenabê mamosta Bêxud teşrîfî Kerkûkê kirîye, çûme xizmetê li ber tekyê û pişt xêrhatin û rewş pirsînê min erz kir li vir em bi tirkî stranan distirên. Wî jî got ; “Îjar Mistefa çi divê (dixwaze)?. Min got ; “Sirûdekê bi kurdî ji bo me binîvsîne em jiber (ezber) bikin. Kerem kir got ; “de başe sibê were sirûdê bibe. Spedê çûme xizmeta wî ev sirûda nivîsandibû (Kerîm M. M., 1970, p. 136).

Paşê dibêje : " Bi xwe jî nusxeyek şandibû Silêmanî ji bo Şêx Nûrî Şêx Salih ku di rojnama da belav bike, îjar dibistanan hemû birin û xwendekaran jî jiber kirin. Sirûda wî li Silêmanîyê hate belavkirin û navê Şêx Nûrî li ser danî bûn û di pirtûka “Stranên Kurdî” bi îmzeya M. Nûrî hatibû belavkirin" (Kerîm M. M., 1970, p. 136).

Herwiha di derbarê ‘eslê vê operêtê da dîtineke (raman) Şakir Fetah heye û dibêje : "Ev strana keçeke ferensî bi navê Cozîf Şenî navek ji bo Şoreşa Mezin Ya Ferensî danîye. Rehmetiyê Mehmûd Cewdet ku sûbay (efser), hunermend û biwêjekî kurd bû, di sala 1925 an da bi pexşan veguherîye ser zimanê kurdî. Şêx Nûrî jî ku hunermend û biwêjekî wê demê bû helbest û lengereke wî ya taybet û ciwan bo dozîyewe li ser awaza “Wezî Weten” ya farisî. Di sala 1927 an da ji aliyê Tîpî Zarikirin û Saz û Awaz ya Xwendegeha ya Silêmanîyê ve ev strana bi şeweyekî temaşe wate operêt ve hatîye zarîkirin (pêşkeşkirin) .

Diyare ku pirsgirêka nivîsandin û amadekirina vê operêtê hebû, lê çawa be jî tiştêkî teze û nû ye di helbesta kurdî da û zêdetir ji yê Şêx Nûrî çimkî bi vê cûreyê helbest û sirûdên Bêxud tunene.

Gerçî helbestên stanzayî yê Şêx Nûrî hene ku nêzikî van cûreyane, herwiha ji bo ku sûdê ji berhemên neteweyên din jî bigre dixebitî wek berê me behsa vê mijarê kir. Lê hewqas helbestên Şêx Nûrî hene ku wek xwe nenivîsandîye, kincên kurdî li wan kirîye û dibê ku wek zadayên ramaneke kurdî ye û ji bo kurdan hatîye gotin.

Mihemedê Mela Kerîm di “Pêdaçûnek Bi–Dilaweran-a Dîwanî Bêxud da” (Ebdalwahid, 1985, p. 61) behsa meseleya ‘eslê operêtê dike ku gelo (aya) ya Bêxûd e yan ya Şêx Nûrî ye. Di wir da deqa gotara wergerî ya Mehmûd Cewdet dûbare belav kirîye ku demekê di jimare 21 -22 yê Rojnameya Jiyanewe di Adara 1925 an da belav kiribû.

Di vir da derdikeve ku navê nivîskarê wê Cozîf Şenî nîye wek Şakir Fetah nivîsandîye Marî Zozef Şenî ye.

Paş hewsengandina dîtin û ramanên cuda cuda, boçûna xwe bi vê cûreyê derdibri (îfade dike) : "Ewên ku li gor wan ya Şêx Nûrî ye belgeya wan ya giring ewe ku helbesteke din ya Bêxûd bi vê mijarê tuneye û ew helbesta jî bi navê Şêx Nûrî ve hatîye belavkirin.

Belkî helbestên nîştimanperwerî yên Bêxud kêmin, êdî çawa dibe tenê bi şahîdî yek kes pişta Bêxud digre?. Ewên ku dibêjin ya Bêxud e çend belgeyan tînin.

- Ew e ku Kak Mistefa Sayib, hîna li cîhanê ye û bi devê xwe dibêje; ev helbesta ya Bêxud e û sedema nivîsandina wê jî ji me re eşkere dike. Di warê van cûre mijarana da pisporîya berfireh ya Kak Mistefa heye belgeyek jî di destê wî da tuneye ji bo ku em bibêjin vê helbesta Şêx Nûrî bike ya Bêxud.
- Ew e Bêxud hinek helbestên din jî nivîsandine bi navê "M. Nûrî" û belav kirîye, pisporên jiyana Bêxud û Şêx Nûrî bi vê zanin û înkara vê rastîyê nakin. Kewate (yanî) ne dûre ku "Dilaweran" jî yek ji wan helbestana be.
- Ev tiştêkî balkêşe ku Bêxud vê helbesta xwe bi navê Şêx Nûrî belav bike, çimkî helbestên wiha nîşaneyê "munewweriyetî" ye ku ji bo mêrekî xanedan û dîndar (olperest) wek Bêxud di wê demê da ji alîyê gel ve bi hêsanî nehatîye pejirandin û ji ber vwan sedeman neçar bû bi navê M. Nûrî belav bike ku kurekî gênc û nûgihîştî bû" (Kerîm M. M., 1970, p. 17).

Helbesta Dilaweran 7 parçe ye: Delaweran 4 dêr e, –Bawik 7 dêr, Dayik 4 dêr, Minalekan (zarok) 4 dêr, Afret (jin) Be Minalewe 4 dêr, Kiçekan 4 dêr, Çek Bedestekan 4 dêr.

Herwek di vir da derdikeve tenê parçeya "Bawik" 7 dêr e, ewên din hemû çar dêr in. Têbînîya wê jî têkirin ku parçeya "Kiçekan" ji nîvekê ve (le nawerrastewe), li dû dêra duyem nîvdêreke bi tenê hatîye îjar dêreke din ya mesnewî li dû wê hatîye. Ev tiştêkî ne dirust e, lê nîvdêra wê xwe bê beşkirin dibe du nîvdêrên kurt û ev kêmasîya tije dibe.

Ji bilî wê ku ev operêta xwe bi xwe hunereke nû ya helbestî ye, Şêx Nûrî nûkirinên din jî têda kirîye. Du cûreyê kêşa ‘erûzî û xwemalî têda bikaranîye, di behsa kêş da emê li ser vê mijarê rawestî.

Di her parçeyên vê helbestê da yek, du, sê dêr hene, dikare bête letkirin (qetkirin) û her letî bike du letên biçûk. Wekemînak parçeyê yekem yê ‘Dilaweran’ bi vê cûreyê hatîye nivîsandin

Ewladî weten ême ke wa mîlletî kurdîn
Bo xayeyî asayîşî mîllet hemû gurdîn
Şêrane ewa me’rekey arayî wexa bûyn
Bo riştinî xwênawî ‘edû hazir raye bûyn
Le pêşmanewe her wa, beydaxî zefer erwa
Rîşeyî ‘edû ba derbênîn, heqî bedestî xoman bistênîn
Bo nemanî mezalîm, siwaranî cengî
Teplî bazyan lê da be şox û şengî (Ebdalwahid, 1985, p. 61).

Dikare ku ji dêra sêyem da, her le têk bikirêt bi du nîvdêr, bi vê ve dêra wê dibe du dêrên kurt:

Darijtina parçeyan bi vî avayî ne:

Ewladî weten ême ke wa mîlletî kurdîn
Bo xayetî asayîşî mîllet hemû gurdîn
Şêrane ewa me’reke arayî wexa bûyn
Bo riştinî xwênawî ‘edû hazir raye bûyn

Le pêşmanewe her wa
Beydaxî zefer erwa
Rîşeyî ‘edû ba derbênîn
Heq bedestî xoman bistênîn
Bo nemanî mezalîm siwaranî cengî
Teplî bazyan lê da be şox û şengî

Bi vî avayî (cûreyî) ev parçey dibe 5 dêr. Ev vetîreya (dîyarde) bi şeweyên cuda cuda li cihên cuda cuda da di hemû parçeyan da dúbare dibe.

2.2.3 Çîroke Helbest (Çîrokên Helbestî)

Her ji demên berê da çîrok û şanogerî bi helbestî hatine nivîsandin, ji bo ku bi hêsanî werin jiberkirin û bimînin. Hemû destanên navdar yê cîhanê bi helbestî hatine nivîsandin wek "Îlyada û Odesa" yê Homeros, "Enyada (Aeneis)" ya Vergilius (Vêrcîl), "Komediyeya Yezdanî" ya Dante, "Ramayana û Mihabharta" ya Hîndî, "Şaname" ya Fîrdewesî, "Xemse" ya Nîzamê Gencewî, "Mem û Zîn" ya Ehmedê Xanî, "Yusif û Zuleyxa" ya Selîmê Silêman û "Leyl û Mecnûn" ya 'Harisê Îtlîs... Hemû malikên (beyt) kurdewarî ku wek berhemeke wêjeya gelî (folklorî) di nav da hene:

Baram û Gulendam, Las û Xezal û Kerîm û Sitê ... bi helbestî hatine nivîsandin. Ji bilî van helbestvanan gelek car pêwîstîya helbestan zanî bûn heta çîrokekê pê bihûnin ku zimanê wê hunerîtir be û bi hoya kêş û beşavendê ve (serwawe) baştir bikeve ser zimên.

Li gor dîtina Bûrhan Qan' ; "Çîrok bi helbest di nav kurdewarî da serdemeke wê ya kevn heye ku di serê hatina dîne îslamê da bi pê ew belgeyên ku em piştî xwe didin wan em dikarin behsa vê mijarê bikin " (Qanî, 1970, p. 22), paş vê navê 30 çîrokên ceng û evîndarîyê anîye ku bi helbestî hatine nivîsandin.

Çîrokên helbestî di wêjeya kurdî da ji aliyê Şêx Nûrî, Goran û Dildar dikevîne berçav û xuya dikin. "Diyare bi helbestên kurt nedibû ku bi hêsanî bûyerên rast bête derbirîn, loma (ji ber wê) ji salên bîstan heta salên çelan cûreyekî destana lîrikî (dramaya helbestî) bi pêwîstî ji dayik bû ji bo ku bi kûrahî xebata çîneyetî (klasîzm) û rizgarîxwazî ya netewayetî derbibire (îfade bike).

Çîrokên helbestî, herwek ji navê xwe diyare çîrok e, lê bi keresteyên helbestî "kêş, beşavend, wêneyê helbestî, zimanê helbestî, xaze (mecaz) "tê derbirîn. Wek hemû çîrokên kurt bûyer (rûdaw), kesayetî, cî, çînin û hêmanên din yê çîrokî têda ye, yekcaran gotûbêj jî dikeve nav.

Şêx Nûrî wek nûkirineke helbestî çend çîrokên helbestî nivîsandîye ku pêştir ji bilî destan û malikan ev cûreya wêjeyî di wêjeya kurdî da tunebû wek ; "Karwanî Jiyan" ('Ebdalwahid, 1985, p. 234), "Le Xewma" ('Ebdalwahid, 1985, p. 239) û "Bo Mêjû"

('Ebdalwahid, 1985, p. 257). Di "Karwanî Jiyan=Karwanê Jîyanê" da serî bi wê dest pê dike ku digel karwanê gel (xelkê) bervî bajarê jîyanê diçe.

Berew şarî jiyan, şiwên karwanî xellqî dê kewtim

Ke rê kewtim, milî rêm girt û azane be rê kewtim ('Ebdalwahid, 1985, p. 234).

Paş vê cîhekî (şûnekê) pêşkeş dike ku rê birriynewe û bi hûrgilî wesfa vê rêya dike, dema ku bir ê ve diçe wesfa siruşt û derdorê dike:-

Berim deştê bû, ta çaw birreka deryaçeyî qûm bû

Ke pêm lê dabnaye, daeçû qaçim, heta ejnom ('Ebdalwahid, 1985, p. 234).

Îjar tê ser behskirina kiş û matî siruştê ku;

Ne dengî zengî karwanê, ne xişpey mar û mêrûle,

Ne wirşey ballî balldarê, ne gîzey mêş û mêşûle,

Ne giyandarê, ne rêywarê, ne cirîwey çolekeyê.. Nedehat.

Îjar behsa derd û meyneta çûyinê û westandina rê dike:

Pel û pom lê birra, hêzim nema tiwêxî berî pêm çû

Heta lem deşte çoll û holl û bê awe, necatim bû ('Ebdalwahid, 1985, p. 235)

Li dû vê girêka çîrokê tund (sert) girê dide, rîya wî bi deryayeke herî û qûmeke avzêyî (zelkaw) heta navê dikeve nav herîyê:

Serim hênaw serim bird lem qurre rizgarî min nabê

Îradey Xwa weha ye rojî jînim lêre awa bê ('Ebdalwahid, 1985, p. 235).

Vekirina girêka çîrokê û rizgarbûna wî ji vê herî (qurr) û gîlê (lîte), bi derketina şivanekî xwe rê didê û ban şîvên dike ku wî ji wir derxe, şivan qayîşa (piştên) xwe hildidê û jî wê herî û avzême derdixe.

Îjar paş vê, spêdê (beyanî) zû temaşe dike çîya û zinar û bax û gulzar diyar e, bervî wan diçe û dibîne ev mebesta (daxwaz) wî ye:

Gulistanêk ke kanî û awekanî, çeşmeyî kewser

Heta çaw birreka her lawaz e, her çeme nizar e ('Ebdalwahid, 1985, p. 237).

Paşê jî dixwaze derkeve serê çîyê, lê di nivê rê da ji pê da dikeve...

Çîroke helbesta wî di vir da diqede (kotayî dêt) û daxwaza helbestvan di vê çîroka helbestî da eşkere û zelal e ku "Şarî Awa=Bajarê Ava" bajareke ku kes nagêjê.

Di dawîyê da jî bi vê kurteyê bîr û ramanên xwe bi du dêran dadirêje:

Sefer bo şarî jîn gerçî xem û derde be naçarî

Hemû kes boy eçê, emma yekê eygatê bê azar

Yekê wek sêberî xoy waye her errwat û nayigatê

Heta ew roje şûme, dayehêllnegorrî tîrewtar ('Ebdalwahid, 1985, p. 238).

2.2.4 Tesmît

Tesmît di ziman da davkirina mûrû ye û ji mûrûya helbestê û ji davkirîyan re tê gotin. Bi têgiha (zarawe) wêjeyî, parçe helbesteke ku dabeşî parçeyekî biçûk û hev kêş bûye. Her parçeyek 5 yan 6 nivdêr e û hinek car ji vê kêmtir yan zêdetir dibe ku ji bilî nivdêrên dawîyê ku her parçe hemû hevbeşavend in û nivdêra dawîyê hemû parçeyên wê jî di beşavendê da wek hevdu ne" (Zeyn Elabîdîn Motmin, 1371, pp. 29-30)

Cûreyên musemmetê ji hev cuda ne û her yek bi şaxên cuda cuda jê diqetin.

"Museummet divê wiha be ku çar yan pênc be, çarîneyeke ku nivdêra çarem digel nivdêrên hemû parçeyên din hevbeşavend be" (Dr. Es'ad 'Ebdulhadî Qendîl, 1975, p. 314) yan jî "museummet cûreyê qesîde yan helbesteke yek kêş e, ji parçeyeke biçûk pêk hatîye ku hemû di kêş û hejmara nivdêran da wek hevdu ne û di beşavend da cuda ne" (Humayî, 1377, pp. 1371-1377).

Di helbesta kurdî da tesmît bi vê cûreyê hatîye: "tesmît di bingehê da li ser azîneya (çonyetî) dabeşbûna beşavendên let hatîye ne dêr. Hejmara letên parçeyên tesmîtê bi piranî

di navbera 4 -8 let da ye. Li gorî hejmara ew letên (beş) di dawîya parçeyan da ne beşavendên wan diguherin, du cûreyê tesmîte heye:

- Wiha dibe ku di her parçeyekê da, tenê yek leta dawiyê da beşavenda wê diguhere û hejmara letên pêşiyê çiqas be jî (3 -7) dibine hevbeşavend, îjar letên dawîya hemû parçeyan wekhev dibin û parçeyan bi hevdu ve girê didin.
- Wiha dibe ku di her parçeyekê da, hejmara letên wê çiqas be jî lêtên wê dibin hevbeşavend, lê tenê du letên dawiyê di nav xwe da dibin hevbeşavend û letên din cuda dibin. Bi vê dawîya her parçeyê wek mesnewî xwe rê dide " (Gerdî, Serwa, 1999, p. 278) .

Şêx Nûrî gelek musemmetên pêncî peyvî jî nivîsandîye

Di musemmetên pêncî da wek helbesta "Şîwenî Şêx 'Ezîzî Biray=Zêmara Şêx 'Ezîzê Birayê Wî'" ('Ebdalwahid, 1985, p. 119) û "Îstîqbal Bo Taze Pêgeyiştuwekan=Pêrgîniya Ji Bo Nûgihîştîyan'" ('Ebdalwahid, 1985, p. 163). Herwek ku li gorî E'hmed Taqane ev ji Tofîq Fîkret wergirtîye û bi gelek destkarî û guncandinê ve kirîye kurdî (Taqane, Tofîk Fîkret û Helbestvanên Nûxwazên Kurd, 2001, pp. 35-43), dewê (tenanet) sîstema tesmîta Şêx Nûrî û hevalên wî sûd ji sîstem û teknîka helbesta nû ya tirkî wergirtîye ji bo tazekirina helbesta kurdî.

Di serî da dibêje

Sib'heynê em tecddude bo to ye ey şebab

Bo to ye ey umêdî weten xadîmî heyat.

Ey aftarî fecr-î emel, mayeyî necat

Subhî se'adetêkî 'eceb pak û bê sehab.

Her çawerrwanî to ye desa fîrsete şetab ('Ebdalwahid, 1985, p. 163).

Helbesta wî heşt parçeye û her parçe 5 nivdêr in, ji her yekê çar nivên pêş bi şeweyê çarîne ne (çarîneyên pitrarkî), nîva pêncem ya hemû nivdêran jî beşavendên wan wek hevdu ne ku dengên "ab"e, peyva beşavenda nivdêra pêncemên parçeyan ev in: "şetab, 'hîcab, 'ezab, şebab, nîqab, mahtab, feyzab, aftar". Çend musemmetên Şêx Nûrî yên şeşî jî hene, ev du cûrene li ba Şêx Nûrî. Hinek her parçeyên wan şeş nivdêr in ku çar nivdêrên pêş hevbeşavend in û beşavendên du nivdêrên dawiyê jî cuda û wek mesnewî ne

û heman beşavendên mesnewî di dawîya hemû parçeyan da dúbare bûne. Wek helbesta “Şîwenî Şêx ‘Ezîrî Biray’” (Ebdalwahid, 1985, p. 119) û “Emşew Le Xewa=Îşev Di Xew Da” (Ebdalwahid, 1985, p. 320).

Di vê helbesta dawî da ku pênc parçe ye, her paçeyek şeş nîvdêr e û çar nîvên pêş her paçeyê hevbeşavend in û du nîvên wê yên li dû tê jî mesnewî ne û mesnewîya li dawîya her paçeyê beşavendên wan hene, wate yekîtîya beşavendan di navbera mesnewîyan da tune ye. Di paçeya yekem da

Emşew min le xewa min dîhî wetenim dî
Zor ciwan û be şuş û fereh û şox û şenim dî- e nim dî.
Mesrûr û terr û taze û pirrxunçe û deqenim dî
Xoş îşwe wek ahûyî çîn û xutenim dî

Pirsîm çîye em xoşî û zewq û sefayet
Em şadî û şewq terrebî bê xed û xayet. (Ebdalwahid, 1985, p. 320). Ayet

Peyva beşavend yên mesnewîya dawî ya parçên din bi vê cûreyê ye ; “Turkan–Xendan / Kerim çî–Hunerim çî / ‘Îraqî–Nîfaqî’”.

Her di vê cûreyê da, gelek car wiha dibe ku mesnewîyên dawî yên (li dû hevdu) hemû paçeyên wê hevbeşavend bin û nîvdêra li dû jî wek xwe be, guherîn û destkarî dúbare bêtekirin wek di helbesta “Feryad” da hatîye ku helbestek pênc parçe ye. Di paçeya yekem da dibêje

Umêdî zemanê emelêke bed û bê sûd
Mazît hemû her derd û fîraqî elem efzûd.
Hallîşit wekû rahetî rabûrdu xem alûd
Musteqbel û axir nefesit meqberî mesdûd.
Lem xellqete meqsûdî çî ye Hezretî Me’bûd
(Feryad az ayin nu’ wicud ‘idim alud) (Ebdalwahid, 1985, p. 320).

Di hemû parçeyên vê helbestê da, beşavenda mesnewî ya dawî wek xwe ye û nîvdêra dawî jî bê destkarî dúbare bûye, ewên ku diguherin beşavendên çar nîvdêra pêş her parçeyan e ku her çar jî yek tiştin, ev ji ber dúbarebûna nîvdêra dawî ye ku bervî tercî' bendê ve dibe.

Hinekên din her parçeyekî wan şeş nîvdêr in, beşavendên pênc nîvdêrên pêş wek hevdu ne û beşavenda nîva şeşem cuda ye digel beşavenda dawî yên hemû nîvdêrên parçeyên din yek digre (wekhev digre).

Ev jî di vê helbestê da hatîye bikaranîn: "Dilî Min" (Ebdalwahid, 1985, p. 167) ku wek helbesta "Lew Rojewe Torawe Dillî Min" ya Bêxud ku 15 parçe ye û her parçeyekî wê şeş nîvdêr e û nîvdêrên dawî yên hemû parçeyan hevbeşavend in.

Di yekem parçe da dibêje

Lew rojewe toy dîwe perêşane dillî min

Sewda zedewî bê ser û samane dillî min.

Pîşey xefet û şîwen û giriyane dillî min

Gawêllî kej û kêwî biyabane dillî min.

Ga derbederî kuçeyî şarane dillî min

Sersamî pell û berdî minalane dillî min (Ebdalwahid, 1985, p. 167).

Beşavenda nîvdêra şeşem ya parçeyên din ev in: "Xezelxwane dillî min, nalane dillî min, musillmane dillî min, giriyane dillî min, nadane dillî min, barane dillî min, torane dillî min, îmane dillî min, kêwane dillî min, şêtane dillî min, tane dillî min, giriyane dillî min, besezmane dillî min, fermane dillî min".

Di tesmîta şeşî da, Şêx Nûrî di helbesta "Saqiya Ew Behare Royî Dey" da dahênanekê nû di derbarê dabeşkirina beşavendên nîvdêran da kirîye ku pêştir evdî helbesta kurdî da berçav neketîye.

Helbesta wî çar parçe ye, her parçeyek şeş nîvdêr e, sê nîvdêrên yekem hevbeşavend in, sê nîvdêrên duyem jî her hevbeşavend in. Wate du cûreyê beşavenda her parçeyê wek parçeyên din hene lê dabeşbûna nîvdêran bi ser ev du beşavend da cuda ne. Di parçeya duyem da dibêje

Saqiya bulbulan le ser liqî gull
Nalleyan dête giwêm be soz û be koll.
Toş were hellse bo feraxetî dill
Bêne gerdîş, piyale pir ke le mey.
Çunke bîstûme min le nalley ney

(من الماء كل شيء حي) [الانبياء- ايه 30] ('Ebdalwahid, 1985, p. 196).

Di vir da hevsengîyek (wekhevî) dirust dibe, divê di dabeşbûna beşavendê da ji bilî vê, ewê k udi vê helbestê da têbînîya wan tênkirin du tiştin:-

Du nîvdêrên dawî yên hemû parçeyan wek xwe dûbare dibin û nîvdêrên çarem jî bi guherîneke gelekî kêma dûbare dibin. Ji ber vê yekê sê nîvdêrên dawî yên hemû parçeyan ji ber beşavendan wekhev bin.

Di dawîya hemû parçeyan da, ew parçeya ayetê dûbare bûye ku dibêje:

(من الماء كل شيء حي) ku parçeyeke ji ayeta

" أولم ير الذين كفروا أن السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضَ كَانَتَا رَتْقًا فَفَتَقْنَاهُمَا^ط وَجَعَلْنَا مِنَ الْمَاءِ كُلَّ شَيْءٍ حَيٍّ^ط أَفَلَا يُؤْمِنُونَ " [الانبياء- ايه 30].

3. HÎNEK HÊMANÊN NÛ YÊN HELBESTÊN ŞÊX NÛRÎ:

Helbestên nû (teze) wek şoreşekê li ser destûr binemayên (bingeh) peyîtî yên(çespaw) kevn, bi taybetî di derbarê kêş, beşavend (serwa), awaz, wêneyê helbestî, îqa' û şêwazê ve hatîye ku erka bandordarîya heryekî/heryekê di xurtkirina avahîya helbestê da heye û dahênana helbestvan heta radeyekê bi gelek şêweyên danûsendinê digel van hêmanan da derdikeve.

Ji ber vê yekê heta ezmûna helbestî ya helbestvan zêdetir û selîqey wî/wê ya wêjeyî naziktir û rewşenbîrîya helbesta wî/wê berfirehtir be, dikare bi çavekî ku her aliyê dibîne temaşeyî tiştan bike û bekarmeyî îş li wan hêman û materyalan bike ji bo ku dahênana wêjeyî encamê bide. Pêwendîya helbestvanên nû bi pirsgirêk û bûyerên serdema xwe, pêwendîya temaşekirinê nîye ku çi dibîne wan wesif dike û bi wan bandordar dibe, belkî helbestvan xwe bi xwe di wan bûyeranan da dijî û xwedî ew pirsgirêkanan e " (Îsme'îl, 1972, p. 13).

Helbest ji pexşanê (tekst, metîn) cuda ye ku peyv, destewaje (koma peyvan) û darijtina zimanvanî erkên serekî têda dibîne, loma (ji ber wê/vê) helbest di dema wergerrînê da beşeke gelek yê aliyê helbestî û ciwananasîya (estetîk) xwe ji dest dide ku girêdayî deng, awaz û rêkxistina peyvan e.

Pêkhate û taybetîyên helbestê di zimanê wê da xurt û bihêz dibe, loma ziman derîyê serekî ye ji bo çûyîna nava helbestê û lêhûrbûna ser wê ye. Ziman rêyeke girînge ji bo lêkolîn û dîtina şîyana helbestê li ser pêşveçûn (geşesendin) û neş û nimakirinê ye. Loma gelek girîngîya ruxsar û dirûva (şekil) helbestê heye û digel guherîna naverokê da herdem di guherînê da ye" (Mubarek, 1993, p. 25).

Her dirûveke nû di encama hatina ramanek nû da dirust dibe (tê holê, çê dibe). " Dirûv (şikil, form) guzareştê (ta'bîr) li rewşeke hedarî (îstîkrarî, seqamgirtû) dike ku dikare di demeke diyarkirî da (bellî) bigêhênê (bigêjinê), naverok jî ji liv (lebat, cûle) û guherînê pêk tê. Naveroka nû sînorê şêweyên kevn têk dişkîne û şêweyeke nû tîne holê " (Îsme'îl D. X., 1974, p. 51).

Wate "Di naveroka nû da şîyana guzarîşt ya şêweya klasîkî ya wêjeyê namîne li naveroka nû û ev xeta (xêz, hêl) di maweya pirsgirêka di navbera kevn û nû da dibeze (direve)" (Resu, 1966, p. 90).

Çimkî nabe herdem ji yek gozeka (goşenîga) takekesî ve li wêjeyê binêrin, belkî dibe ji her du alîyan da bête (were) temaşekirin ". Çimkî wêje tenê ne wate û bîr û raman e û her tenê ne bîr û wêne û darriştin e, belkî encama dehaya (bilîmet) xwedîyê/xwedîya xwe ye û ji herdu alî ve; bi wateya hûr (wird) û dariştina baş xwe rê dide" (Tebane, 1985, pp. 196-197).

Pêwendîyeke xurt ya şêweyê helbesta nû bi canê serdema xwe ve heye, çimkî bûyerên mezin yên cîhanî û netewayetî û pêşketina bilez ya şaristanîyê cûreyek şêweyê helbestî û wêjeya nû wiha disepîne (ferz dike) ku digel canê serdemê bigunce û bikaribe danûsendnê digel hest û soz û daxwazên mirovan da bike li hemberî ev bobelat (karesat) ên mezin, kist û tijî. Pêwendîya helbesta nû bi çarçeweya şaristanîya giştî ya serdema xwe ve heye di asta rewşenbîrî, civakî û siyasîya cuda cuda da.. Helbest herdem guzarîştê li canê şaristanîyetên taybet bi her serdemê da dike (Îsme'îl D. , 1972, p. 16). Loma her helbesteke rasteqîne û rastgo berhema serdema xwe ye û neynikeke (awêne) ku sîmaya serdema xwe derdixe çimkî "helbstvanê hevçerx herdem hewlê dide ku helbesta wî/wê parçeyekî têkçirjaw be û... di vir da helbestvan naçar e ji bo piştrastkirina yekîtiya mijarî, hunerî û muzîkîya giştî ya helbesta xwe şorrêk li dijî yekîtiya kêş û yekîtiya beşavendê bine holê (Tebane, 1985, p. 333).

Yek ji sîmayên herî dîyar ye wê yekîtiya ji ser heta pêyê helbesta nû bi giştî digre, derkirina her dêr , nîvdêr, koma peyvan û peyvan e ku bandorê li wateya helbestê dike. Herwek ku paş û pêşkirina dêran wateya helbestê kelkoti (pilûçî, şêwandin) dike. Yekîtiya 'uzuy yek ji wan bingehên girînge ku bizava helbesta nû doza wê dike, dîyare ku her ji ber vê jî ketibe jêr bandora helbesta rojavayî (Ce'fer, 1988, p. 42).

Ev yekîtiya 'uzuyê tenê darijtina rêzimanî û wateya helbestê nagire, belkî awaz û muzîkê jî digire". Hinek rexnegir wiha diramin (difikirin) ku di nav dêrên şêweya nû da yekîtiyeke muzîkî û hevgirtineke awazî heye " (Yûnis, 1985, p. 80).

Li gorî hinek rexnegiran bi taybetî ewên li ser rêbaza psîkolojîyê xebatan dikin û şîroveyan ji bo şêwaz û avahîya çêbûna berhemên wêjeyî û bandorê li xwendekaran dikin, wiha dibêjin ; "Mebesta nû (teze) û cûreya wêjeya nû tevger û wêneyê helbesta nû tînin holê, pêwîstîya vê jî bi şêwazeke nû heye .

Erka ziman ya serekî di helbestê da heye çimkî , "bi ziman guzarişt (tabîr) li berhemên wêjeyî têkirin ku ji komêk sîstemên amajeyî (nîşankirî) pêk tê... Berhema wêjeyî xebateke taybetî ya hunerî ye û pêwîstiya vekolîna wê jî bi rêbaza nû heye. Di heman demê da armanc û girseya (cemawer) wê ya taybet heye ku ji girseya zanistê ye û pîsporiyên wan gelekî cuda ne" (Haf, 1985, p. 111).

3.1 Kêş

Gelek pênaseyên cuda cuda ji bo beşavenda helbestî hatinekirin ku hemûyan cextê li ser awaza deng û guncana di navbera deng û dîkin." Kêş, hûnan û guncaneke taybetî ye ji deng (- kêteyan birrgekan). Ev hûnan û guncana deng li ba gelên (mîlletên) cuda cuda bi şeweyê cûr bi cûr şewazên awaz û mosîqayê (muzîkê) derdixe" (Şemîse, 1374, p. 120), ku dibêjin guncana dengên gelên cuda cuda bi şeweyê cûr bi cûr awazê derdixe amajeyê ji bo kêşên bîngêhîn yê cîhanî dike ku bi pê çar binemayên cuda diguherin: kurtî û dirêjî û bihêzî û bê hêzî û jimare û asta (tebeqeya) deng (Gerdî, Serwa, 1999, p. 84)." Kêş cûreyatebayyêke ji denge ku dibe pêwera (pîvana) hêlengandina muzîka helbestê û tebaya rewşêke ji derxistina yekîtiyek ji nav parçeyên cûr bi cûre ku tebaya di cî (şûn) da be jê re dibêjin "qirîne" û eger di demê da bi jî jê re dibêjin "kêş" (Sîmadad, 1375, p. 316).

Wate kêş hestkirine bi yekîtiyekê ji nav komêk tişt ku di mewdayeke demêk dîyarkirî (bellî) da dûbare dibin. Bi vî awayî kêşa helbestên kevn yê her gelekî cûrên binema û destûrên wan heye, " eger ji wê destûrê derkeve ew kêşa kulek (leng) dibe " (Dr. Reşîd 'Ebdelrehman El 'Ebîdî, 1986, p. 259).

Lê di helbesta nû da corek azadî heye di danûsendina digel kêş da û dikare di çarçeweya îqâ'a giştî ya helbestê da dahênanêke teze çê bike ku bi sedema wê bikari be baştir hest û soza xwe pê derbibe (îfade bike). Wate kêş û îqâ'a wê digel hest û soza helbestvan da bigunce, ne ku helbestvan gelek hewl bide ku cihê hest û soza xwe ya di nav kêş û îqâ'ê da veke.

Her ji ber vê ye jî ku alîgirên helbesta nû di derbarê kêşa helbestê da wiha difikirin ku "helbesta sitûnî yek ahenge û muzîka (awaza) helbesta nû jî cûr bi cûr e, yaxud tu (hîç) nebe helbesta kevn ji helbesta nû weriskertir e " (Yûnis, 1985, p. 181).

Ev nûvekirina kêşa helbestê divê di encama pêgihîştina rewş û pêşketina jîyarê hati be, hemû guherîn jî ji naverokê dest pê dikin û paşê di ruxsarê da olanê didin (deng vedidin). "Şêweyê stûxwarkirinê (milkeçî) naverok e . Cewhera nû ew e ku li dû şêweyê nû digere çawa te û qaşîkê (qalik, tiwêkil) te dişkîne îjar bejnûbal derdikeve, ew jî bi vê cûreyî çarçeweya girêdanê dişkîne" (Tebane, 1985, p. 333).

Helbesta nû di pêvajoya (rêrew) nûbûna kêş û beşavendê da bi çend gavan derbas bûye, wek; helbesta "mîrsel" wate "blank verse" ku kêşa wê tê parastin lê beşavenda wê tune, herwiha "helbesta azad" wate "free verse" ku xwe bi kêş û beşavenda kevn ve girê nade. Ev helbest binemaya kêş û beşavenda kevn diparêze lê bi temamî xwe bi destûrên darêjkirî ve girê nade. "Helbesta pexşan" wate "prose poem" ew e ku bi temamî xwe ji binema û destûrên kêş û beşavendên teqlîdî dûr dixê û tenê canê helbestî di berhema wê da dimîne û îqa'êke giştî û bi lîstina dengê peyvan ve bi rehayî û azadî cihê kêş û beşavendan digre. Loma " kêş jî wek îqa' nabe biçin ku way biçin ke le wşekan xoyandaye , yan weke lêdana daholê (def) da ye, kêş le wirujêner da nîye, belkî di bersîv danînê da ye" (Mewafî, 1984, p. 239).

Wate dirûva (çonyetî) di wergirtinê da bandora kêş û îqa'ê li ba xwendevan û guhdaran giring e, ne hêsina (xud) kêş û îqa'ê. Çimkî armanca anîna kêş û îqa'ê ew e ku awayeke (cûreyek) hestên taybetî li ba xwendevan û guhdaran bilivîne... "Muzîka helbesta nû zêdetir tevlihev e yan jî zêdetir li kêleka tevlihevîyê da ye lê muzîka helbesta kevn sade bû" (Yûnis, 1985, p. 219). Wate armanca sadeyî ya muzîka helbesta kevn, yek rewî ye bi pêy sistema kêş û îqa'a xwe li dû hevdu tê û bi awayê zincîrê dihere, lê di helbesta nû da muzîk bi awayekî dadirêje ku awaz û îqa' di nav hevdu da dihere û ev dibe muzîkeke tevlihev.

Di kurdî da şêwezarê goran her di serî da awayekî kêşa kîteyî ya xwemalî bikar anîye, bi pirranî (10=5+5) û gelek kêmbi alîyê 'erûzê da çûye, lê helbestên zaravayên din yên kurdî wate "kurmançiya jor" û "kurmançiya jêr" zêdetir bi kêşa 'erûzî ya 'erebî dest pê kirine. Ww 'erûzên ku fars û tirkên û hwd bikar anîne û paşê jî li gorî pêwîstîyê destkarî lê kirine û digel ziman û helbestên xwe guncandine. Bi sedan sale ew kêşa her bikar dihat û serdest bû ku heta serê sedsala borî (sedey rabirdû) komê helbestvanên kurd hatin û destkarî li qalibê çespanî yên kêşa kevn kirin û bizaveke nûxwazîyê di vî warî da derxistin holê.

Wê nûxwazîyê xwe di gelek warê kêş da derdixist, wek; hejmara kîteyan di dêrên helbestê da û tevlihevkirina zêdetir ji kêşekê di helbestekê da, bi şêweyekî binçîneyî jî devjêberdana 'erûzê û vegeerîna ser kêşên kîteyî ya xwemalî ku kêşên resen yên kurdî ne Şêx Nûrî yek ji ew helbestvanên herî pêşeng yên ku mil bi milê naverokê da nûxwazî bi şêweyê helbestê jî bikar anîye û alîyekî şêweyê jî kêş digre nav xwe:

3.1.1 Kêşa 'Erûzî û Kêşa Xwemalîya Kîteyî

Helbesta kurdî her di serî da bi du rêbaz hatîye

- Ew helbestên ku bi kêşa kîteyî ya xwemalî ve hatine nivîsandin. Ev cûreya jî taybetîyên zimanê kurdî der tê û morka xwe ya resen heye.
- Ew kêşên ku bi kêşa 'erûzî destkarî lê hatine kirin û hatine nivîsandin. Kêşa helbesta kirmancîya jêr(Gerdî, Serwa, 1999, p. 5) ji bilî helbestên neteweyî her di serî da li ser kêşa 'erûzî çûye, yek ji binemayên nûvekirina helbesta kurdî vegeerîna ser kêşa kîteyî ya xwemalî bû.

Helbestvanên pêşeng yekser helbestên xwe bi kêşa xwemalî nenivîsandine, belkî di serî da kêşa xwemalî bikar anîne. Ev bi taybetî li alîyê Şêx Nûrî û Goran derdikeve, li dû wan jî Bextîyar Zêwer, Dildar û Dîlan... bi vî cûreyî her du kêş bikar anîne.

Şêx Nûrî "131 helbest bi kêşa 'erûzî ya cuda cuda nivîsandîye: hezec=64, remel=32, muzarî=16, muctes=12, xefîq=5, recez=1 û serî=1..." (Gerdî, Serwa, 1999, p. 398). Ji bilî van kêşên 'erûzî, gelek helbest bi kêşa xwemalî jî nivîsandîye.

Bulbul Fîdatim (10=5+5), Bo Mêjû=Ji Bo Dîrokê (8=4+4), Çiwardey Temmuz=Çardeyê Tîrmehê(10=5+5), Pepûle=Pinpinîk (7=4+3), Bo Bêkes (10=5+5), Naçim Bo Bexda=Narim Bexdayê (10=5+5), Be Kurdî Nawî Mangekan=Bi Kurdî Navê Mehan (10=5+5).

Di ew helbestên cîhanî ku wergerandîye kurdî da her du cûreyê kêşan bikar anîye, ev helbestana bi kêşa kîteyî ya xwemalî ve kirîye kurdî: Roh? (10=5+5), Jîyan (10=5+5). Ev ên li jêrê her yek mînakên cûreyên kêşên kîteyî yên xwemalî ne

ya xwemalî ye, ev gaveke ji bo çûyina pêşî ye ku di çavên ew ên pêş ku her tenê di çarçeweya ‘erûzî da tevlîhevî dikirin.

Şêx Nûrî di helbesta ‘‘Dilaweran’’ da kêşa 'erûzî û kêşa xwemalî bi hev du re bikar anîye. Kêşa wî ya 'erûzî kêşa hezeca heştî ya exrebî ya mekfûfî ya mehzûf (meqêwur) e , di hinek parçeyan da kêş bi ‘‘me’hzûf – fe’ulin’’ diqedin wek; Bawik/Minallekan /Kîçekan. Di parçeyên din da jî kêş bi ‘‘meqsûr-fe’ulan’’ diqedin wek; Dilaweran/Dayik / Afret Be Minallewe / Çek Bedestekan).

Mînak Ji Bo Me’fzûfê

Lem wexte ger ey dujminî kurd êmewe epirsin

Em hemhemeye mîllet hellsawe bitirsin (‘Ebdalwahid, 1985, p. 61)..

Lem/wex/ te// ge / rey / duj/mi//nî / kurd / ême/ we // e / pir/sin //

mef’ul mefa’îl mefa’îl fe’ulin

Em / hem /he/ me/ye/mîl/ le // te / hell / sa / we // bi /tir/sin //

mef’ul mefa’îl mefa’îl fe’ulin

Mînak Ji Bo Meqsûrê

Ewladî weten ême ke wa mîlletî kurdîn

Bo xayeyî asayîşî mîllet hemû gurdîn (‘Ebdalwahid, 1985, p. 61).

Ew/la/dî/we/ten/ê /me //ke/ wa/ mîle/le//tî / kur / dîn //

Mef’ul mefa’îl mefa’îl fe’ulan

Bo /xa / ye //yî / a/sa/yi // şî / mîl / let / he // mû/ gur / dîn

Mef’ul mefa’îl mefa’îl fe’ulan

Ev kêşa ‘erûzî, kêşa xwemalî ye û ev cûreya digel kêşên ‘erûzî anîye.

A- Heft Kîteyî (4+3):

Le pêşmanewe her wa

Beydaxî sefer errwa (‘Ebdalwahid, 1985, p. 61).

le/	<i>pêş/</i>	ma/	ne /	//	we/	her/	wa//
1	2	3	4		1	2	3
4				3			

bey /	da /	<i>xî /</i>	se /	//	fer/	er /	wa//
1	2	3	4		1	2	3
4		3					

B- Neh Kîteyî (3+3+3):

Rîşeyî 'edû ba derbênîn

'Heq be destî xoman bistênîn ('Ebdalwahid, 1985, p. 61).

<i>rî /</i>	şe /	yi//	'e /	<i>dû /</i>	ba//	der/	<i>bê /</i>	nin/ /
1	2	3	1	2	3	1	2	3
3			3			3		

heq/	be/	des //	<i>tî</i>	/	man //	bis /	<i>tê /</i>	<i>nîn//</i>
1	2	3	1	xo	3	1	2	3
			2					
3			3			3		

3.2 Beşavend

Beşavend digel kêş du bineretên (hêman) serekî yên helbestê pêk tînin ku ev her du digel bîr û soz û xeyala helbestî û nûxwazî û alîyên din bi hemû wan ve helbestê tînin holê.

Beşavend li ser bingeha dûbarebûnê ve tê holê.

Dûbare bûna dengê yan çend dengane li dawîya dêrên helbestê yan li dawîya nîvdêran da, wate beşavend awayekî hebûna taybetî ye di helbestê da, çimkî erka serekî ya deng û awaza dangan heye di îqa'a helbestê da."Beşavend ji ew deng yan komek dengên di dawîya peyvan da ye pêk tê... beşavend di dêran da dûbare dibin, bi taybetî di dawîya

nîvdêran da yan di dêrên helbestê û hinek car jî di navînê da jî tê wek dibe ku di pexşanan da jî hebe bi taybetî di dawîya navberan da (fasîle)" (Gerdî, Serwa, 1999, p. 26).

Lê di helbesta nû da merc nîye ku beşavend di dawîya dêr û nîvdêran da be... Helbestvan çawa bixwaze û li gor pêwîstîyê dikare beşavendê dûbare bike, bê wê ku xwe bi tu destûrên taybet ve girê nede." Siruşt (awayê) şêweya nû ya helbestê wiha dike ku dêr di nav hevdu da biçin û têk hilbişkên, bi cûreyê ku dêr wek dêrên helbestê stûnî nebin... Siruşt şiklê nû wê azadîyê dide helbestvan ku bi serbestî beşavendan bîne, herwiha azadîyê didê ku şêwaza beşavendan biguhere û hilbijartina her şêwazên ku bi xwe dixwaze bîne" (Yûnis, 1985, p. 223).

Di helbesta nû da erka beşavendê li ser xurtkirina giştîya helbestê û dîyarîkirina dawîya nîvdêran heye çimkî di helbesta nû da dirêjîya nîvdêran wekhev nîne. "Beşavend bi taybetî di helbestên azad de dîyarîkirina (bellîkirin) dawîya nîvdêran e. Zengekê lê dixê me agahdar dike ku dawîya koma peyvyan yan parçeyek ji koma peyvyan hatîye... " (Melaîke, Saykulucîye El Şi'r û Meqalat Axirî, 1993, p. 64).

Ji ber wê ye di helbestên klasîkî da anîna beşavendan ji bo helbestvanan zehmet e û erkek giring e, helbestvan hewl dide ku ji wê girêdanê rizgar bibe." Gelek helbestvanan hewl dan ku dev ji beşavend û pergala beşavendê ya ku di dawîya hemû dêr yan nîvdêran da tê berdîn û bi tenê bi awaza îqa'a wê dev jê berdidin ku di yeksanî ya kîteyên dêrên helbestê û cewher û îqa'a du kîteyî ya ku li dû hev pêk tê " ('Ebdulreuf, 1977, p. 173).

Ewên ku doza beşavenda azad dikin, armanca wan ew nîye ku bi tamamî beşavend û erka beşavendê ret bikin. Belkî dixwazin di danûsendina digel beşavendê da azad bin ku ji bo dewlemend kirina îqa'a giştîya helbestê da. "Ewên ku li gor dîtina wan helbesta nû di beşavendê da azad e, armanca wan ew e ku yekîtîya rewa azad e, ji pergalek neguher anîna rewa azad e" (Yûnis, 1985, p. 141).

Helbestvanên nûxwazên kurd di bizava nûvekirina helbesta kurdî da awirek dane beşavendê û cûreyekî (awayekî) taybetî danûsendin digel wê da kirine. Goran di derbarê beşavenda helbesta kevn û nû dibêje: "Helbesta kevn li dû hemû malikên xwe bi dirêjîya kêşên qesîde yan xezelan li ser yek beşavendê diçin, lê di helbesta nû da yek beşavend di dêrên helbestê da du du (2-2) bi hev du ve girê dide, li ew alîyê beşavendê bendên dêrên helbestê yek bend zêdetir derbas nabe" (Aşna, 2002, p. 28).

Şêx Nûrî Şêx Salih mil bi milê nivîsandina helbestê da vekolînên wî yên wêjeyî jî hene ku wek pêştir me dît. Beşavend yek ji wan mijaran e ku K. E. di "Edebiyat Kurdî=Wêjeya Kurdî" da behsa wê kirîye, kewate(yanî) Şêx Nûrî, hem bi teorî vekolîn li ser helbestê kirîye û hem jî bi xwe helbest nivîsandîye. Şêx Nûrî li ser armanca anîna beşavendê dibêje: "Meqsed ji beşavendê ji bo derbirîna (îfadeya) temîna ahengeke muzîkî ye" (Aşna, 2002, p. 28).

Dr. Kamîl Besîr di derbarê vê ramana Şêx Nûrî da dibêje: " Riwanîwyetecewhera erka beşavendê û pêwendîya digel xwendevan û guhdar di helbestê da " (Besîr, Şêx Nûrî Şêx Salih Di Sazîya Wêje û Rexnesazîya Kurdî da, 1980, p. 42).

Şêx Nûrî wek yek ji pêşengên bizava nûxwazîyê hewl da ku xwe bi beşavenda kevn ve girê nede, belkî dixwast bi pê pêwîstîya helbestên xwe û bi pê hest û soza xwe azad be di anîna beşavendê da.

Ev hinek alîyên nûvekirina beşavendê ye li ba Şêx Nûrî ku di helbesta kurdî da bikar anîye; Vegerîna Ser Mesnewîyan: Mesnewî (hevbeşavendîya her du nivdêrên dêra helbestê)- Di wêjeya kurdî da ev hebû, hemû çîroke helbestên (helbestên çîrokî) destanên wek "Mem û Zîn" ya Ehmedê Xanî (Xanî, 1989.), "Yûsif û Zuleyxa" ya Selîmê Silêman (Selîmê Silêman, 1986) û "Leyla û Mecnûn" ya 'Haris Bitlîsî (Harîsê Betlîsî, 1985)herwiha hemû helbestên zaravayê goran û pirranîya helbestên folklorîya kurdî bi mesnewî hatine nivîsandin.

Wate helbestvan ji serî heta dawîyê di dawîya dêrên helbestên xwe da tenê yek beşavendê berçav digre (li ser yek beşavendê diçe) lê di bizava helbesta nû da, helbestvan dûbare vegeryane ser beşavendên mesnewî û xezel û qesîde pê nivîsandine.

Şêx Nûrî di hinek helbestên xwe da li ser vê cûreya beşavendê çûye wek:Wergerrîna helbesta "Meqber" ya 'Ebdulheq 'Hamîd (Ebdalwahid, 1985, p. 45) û "Le Kurdistan da Giranî" (Ebdalwahid, 1985, p. 77) ku ji tirkî wergerandîye kurdî, "Şewêk=Şevêk" (Ebdalwahid, 1985, p. 81) ku ji farisî wergerandîye.

Di helbestên xwe da jî ev bi mesnewî nivîsandine: "Bulbul Fîdatim" (Ebdalwahid, 1985, p. 193), "Karwanî Jîyan" (Ebdalwahid, 1985, p. 234), "Lexewma=Di Xwe Xwe da" (Ebdalwahid, 1985, p. 239), "Bo Mêjû=Ji Bo Dîrokê" (Ebdalwahid, 1985, p. 257), "Çiwardey Temmuz=Çardeyê Tîrmehê" (Ebdalwahid, 1985, p. 306), "Pepûle=Pinpinîk"

Şêx Nûrî ev cûreyê beşavendê bi rêya helbestên tirkî ve wergirtîye, çimkî ev cûreyê beşavenda helbestvanên “Serwetî Funûn”yên tirk heye û wan jî li jêr bandora helbestvanên Ewrûpî wergirtine .

Şêx Nûrî helbesta ‘Hawarî Weten’ (‘Ebdalwahid, 1985, p. 300), ‘‘Girdî Seywan=Girê Sîvanê’’ (‘Ebdalwahid, 1985, p. 302) û ‘‘Derdî Dillî Xomim=Derdê Dilê Min e’’ (‘Ebdalwahid, 1985, p. 184) bi vê pergalê ve nivîsandîye.

Wekemînak

Derdî dillî xom cumleyêkî bênime teqrîr a
 Îns û melek û cin perrî dênime giryan b
 Bê şik mute’heyr debê , dêwane le zincîr a
 Sed ‘aqill û huşyar exeme kêw û biyaban (‘Ebdalwahid, 1985, p. 184). b

Pergala ‘‘ab b a’’ : Ev awayê beşavendê li ser du beşavend çêbûye, beşavendên nivîya yekem û çarem wekhev in û yên duyem û sêyem jî wekhev in.

" Wiha dikeve berçav ku her du qetên serî û dawîyê hêz li her du qetên navînê kiribin " (Gerdî, Serwa, 1999, p. 213).

Ev jî wek wê xwe nîşan dide ku mesnewîyek ketibe nav mesnewîyek dinê, ev di helbesta Ewrûpî da bi ‘‘Çarîneya Petrarkî’’ tê naskirin çimkî Petrark di sonîteyên (sonnetên) xwe da du çarîneyên pêşî bi vê pergalê ve nivîsandîye (Gerdî, Serwa, 1999, p. 213).

Wek

Hêlanekey hemû rûxa be gerdelûlî xezan a
 Mecalî hênde neda , hêlkeyêkî hellênê b
 Be nûkî ciwanî denûk , aw û danî bo bête b
 Bikewne ballefrê û serçillî le xem rexsan (‘Ebdalwahid, 1985, p. 221) a

Pergala ‘‘a b c b’’ : Di îngilîzî ji vê beşavendê ra tê gotin ‘‘Belad – Ballade’’ çimkî belad (ballade=helbestên dirêj yên çîrokî) bi pirranî bi vê pergalê ve tîn nivîsandin.

" Her parçeyekî helbestên beladî ji çarîneyekê pêk tê ku pergala beşavenda wan bi vî awayî ye -a b c b- " (Gerdî, Serwa, 1999, p. 215).

Mînakeke çarîneya Şêx Nûrî bi vî awayî (şeweyî) heye, dibêje

Xuda yager be dillma têperrî bê her xeyallê a
 Le 'ezret êşî sext û killpeyî dillme peşewawim b
 Be lutfî xot meger birrwanî be kirdarî narrêkim c
 Le sicilî naumêdî bîsrrê to , kirdewe nawim ('Ebdalwahid, 1985, p. 327). b

Pergala ‘a b b b’: Ev pergala gelekî kêma û kêmpayda ye, nîvrêzên (nîvdêr) 2, 3, 4 hevbeşavendin û dawîya nîvrêza yekem jî wek wan nebe, lê divê qeta (let) yekem ya hemû çarîneyan hevbeşavend bin û bi beşavenda wê nîvrêzê ve jî bi hevdu re bê (were) girêdan (Gerdî, Serwa, 1999, p. 214).

Helbestek Şêx Nûrî bi vê pergalê heye bi navê ‘Giryey Xusran’ (Ebdalwahid, 1985, p. 216) ku pênc çarîne ye û dawîya wê bi pêncîneyekê hatîye ku ji komkirina nîvdêra yekem ya hemû çarîneyên pêşî pêk tê û bi vê jî bûye pêncîneyek hevbeşavend. Şêx Nûrî ev sîstema yekser (rastewxo) ji tirkî veguhestîye nav helbesta kurdî û ji helbestek Tofîq Fîkret wergirtîye. Ev yeke ji ew helbestên ku Şêx Nûrî heta radeya wergerrîne ketîye jêr bandora Tofîq Fîkret, E’hmed Taqane dibêje: " Di nav helbestên Şêx Nûrî da çar helbest bi berçavê me dikevin ku ne her helbestên Tofîq Fîkret bandor lê kiri bin belkî digêje radeya guherîna deq bi deq ya gelek alî û jê wergirtinek xurt û dîyar " (Taqane, Tofîq Fîkret û Helbestvanên Nûxwazên Kurd, 2001, p. 25).

Îjar helbesta wî ya ‘Giryey Xusran’ destnîşan dike ku yeke ji wan çend helbestan. Navnîşana helbestê bi tirkî û li ba Tofîq Fîkret ‘Giryey Xusran’ e û di ‘Dîwana Şêx Nûrî’ da jî her ‘Giryey Xusran’ hatîye nivîsandin ku li ba Sali’h Mistefa Celalî bûye ‘Rexne Le Xo û Sikalla=Rexne Li Xwe û Gazin’ (Celalî, 1984, p. 130).

Naverok û armanca van her du helbestan heta radeya wergerrîne nêzikî hev du ne, ew xala ku ji bom e giring be pergala beşavendê ye. Şêx Nûrî heman sîstema beşavenda Tofîq Fîkretî anîye û hemû çarîne di nîv ya yekem da hevbeşavend in (- an bigrî) û her sê nîvrêzên dawî yê çarîneyan jî hevbeşavend in.

Di helbesta Şêx Nûrî da wek ya Tofîq Fîkret peyva beşavendên nîvrêzên yekem ne ‘bigrî’ ye , belkî heman peyva serî û dawî yê nîvrêzên yekem ‘bigrî’ ye. Bi kurtî ev pergala (sîstem) beşavendê di kurdî da nakeve pêş çavê Şêx Nûrî û helbestvanên dû wî.

Şêx Nûrî ev ji tiukî wergirtîye

Bigrî ey şa’îrî natewan bigrî

Mird le ro'hî mina hemû amal

Bîxu dane kifin biduş milal

Egerê seserî perî xeyall ('Ebdalwahid, 1985, p. 216).

3.2.2 Nûvekirina Beşavenda Pêncîne:

Di dabeşkirina beşavenda pêncîne da bi pirranî di helbesta kurdî da wiha hatîye ku divê hemû nîvrêzên pêncîneyên yekem yên helbestê hevbeşavend bin û hemû nîv yên dawîya pêncîneyên din jî wek pêncîneya yekem bin.

Divê di beşavend û her pêncîneyan da çar nîv yên pêşî hevbeşavend bin, lê di bizava nûvekirina helbesta kurdî da jî bilî vê pergalê di pêncîneyan da gelek pergalên din jî bikar hatine.

Ew ên Şêx Nûrî wek nûvekirinê digel beşavendan da kirîye û bikar anîye ev in

Pergala ‘‘a a a a a’’: Ev di pêncîneya dawî ya helbesta ‘‘Giryey Xusran’’ da hatîye ku me berê (pêştir) behsa vê mijarê kir. Her pênc nîvrêz hevbeşavend in, dengên beşavendan ‘‘an’’ e û paş beşavendan jî ‘‘bigrî’’ û hemû nîvdêran jî bi heman peyva beşavend (qafîye) ‘‘bigrî’’ dest pê kirine.

Vê yekgirtina serî û dawîya nîvrêzan îqa'a pêncîneyê xurt û tijî kirîye

Bigrî ey şîrî nawawe bigrî a

Bigrî ey ro'hî xemnîşan bigrî a

Bigrî ey çîhre xezan bigrî a

Bigrî ey nalle û fuxan bigrî a

Bigrî ey ebrî bê eman bigrî ('Ebdalwahid, 1985, p. 217) a

Pergala ‘‘a b b a c/ e f f e c’’:?? Wiha dibe ku divê di pênc xiştekiyê da nîvrêzên pêncem yê hemû pêncîneyan hevbeşavend bin, lê di tek bi tek di pêncîneyan da ev nîvdêrên pêncemîn divê pêwendîya wan ya beşavendî tune be û bi azadî bimînin. Çar nîvrêzên pêşî jî divê bi qalibê beşavenda çarînî ya petrarkî bi hevdu ve girê bidin.

Şêx Nûrî di ‘‘Îstîqbal Bo Taze Pêgeyiştuwekan’’ da 7 pêncîne anîye û her hemû bi vî qalibî hatine darijtin (Gerdî, Serwa, 1999, p. 223).

Di pêncîneya duyem da dibêje

Ey fecrî xubar û keder, 'alemî emel a
 Çawî le to ye, to ke umêdî hemû kesî a çarînî
 El 'heq 'ilacî derdî dewayêkî newresî b petrarkî
 Hênd çawerrê bû çawî, heta pê geyî subel a
 Fermû direnge, wextay tilû 'itke bê 'hîcab ('Ebdalwahid, 1985, p. 163) .

Di vir da beşavenda çar nîvrêzên pêşî petrarkî ne (a b b a), nîvdêra pêncem ji lwan cuda ye û tu (hîç) pêwendî bi wan ve tune ye (nîye). Lê hemû pêncîne bi vê beşavendê ve diqede (kotayî dêt); şetab, 'hîcab, 'ezab, şebab, nîqab, mahtab feyzab, aftar.

Ev cûreyê dabeşbûnê jî dîyare her li jêr bandora helbestvanên nûxwazên tirk hatîye û di helbestên kurdî da ji bo pêncîne tiştekî gelekî nû ye, pêştir ji alîyê tu helbestvanên kurd tiştekî wiha neketîye ber çavan û nehatîye dîtin ku tu kesî bikar anîbe.

Helbestên Ademîzad ?? jî ji sê pêncîne û di dawîyê da jî ji şeşneyekê pêk hatîye, di sê pêncîneyên xwe da, xwe bi tu destûrên taybet ya beşavendan ve girê nedaye ku bi awayekî hemû pêncîneyan bigre.

Beşavenda sê pêncîneyê wiha ye:

Pêncîneya Yekem- "a b a b a": Wate du beşavendên wê hene (a b), ew jî bi dorê ve (be nore) dúbare bûne. Serî (sereta), navîn û dawî yek beşavend in û herdu yên din jî yek beşavend in, vê pergalê rêxistneke taybet daye pêncîneyê. Pêncîneya Duyem- "a b c a b": Di vê pêncîneyê da beşavenda nîvrêza navînê bêserûber e (berella), wate pêwendîya girêdana beşavendê digel nîvdêrên din yê pêncîneyê tune ye. Çar nîvrêzên din jî dor bi dor dúbare bûne (a b ...a b) .

Pêwendîya beşavenda nîvrêza navînê bi tu beşavendên nîvdêrên din yên pêncîneyê ve jî tune ye.

Pêncîneya Sêyem- "a b a b a": Ev pêncîneya jî deq bi deq wek pêncîneya yekem e, her du her wek hevdu ne û du beşavendên wan heye.

Ev jî her sê pêncîne ne:

Le naw şepollî xema, serengûn û bê aram a
 Le kêwî sextî jîyana, be pê û zingernê ?? b
 Xerîkî hellmetî serkewtine bigate meram a
 Le pirr nişewî killollî, biwarî lê etenê b

Be dawî cewr û xefet, tar û poy ?? le îş û le zam a

Zebûn û rê helle bûy deştî çoll û hollî bella a

Şikiste ball û şipirzey pelarî destî qeder b

Ne destgîrê le lawe desî bidate pelî c

Ne hawdemê xefetî xoy le la bida be hewa a

Belayeka eyewê têperrê, nîye rehber b

Le ber demîşyewe tarîke sêberêkî awer a

Heta ku çawbirreka, tund û tall û bîm awer b

Eda be layewe, exninêtewe be îstîhza a

Hewll eda ke biçê bîgrê, bellam sêber b

Çilon egîrê, behêzî şelêkî bê serûpa ('Ebdalwahid, 1985, pp. 229-230). a

'Elaedîn Secadî naverok û ruxsara vê helbestê şîrove kirîye û di derbarê beşavenda wê da dibêje: " Ji vê zêdetir jî evhelbestên ku heta vê serdemê hebûn gelekî bi beşavendê ve girêdayî bûn, Şêx Nûrî xwe ji girêdanê rizgar kir û helbestên wî jî têk neçûne. Wate tiştê taybetî yên helbestên wî jî têdane ku ji ew peyvên ciwan yên hîlbijarde, wêneyên rengareng yê aşopê (endêşe, xeyal), veguhestina peyvekê ji cihekî bo cihekî din, ji çêkirina hunerê li ser bawerîya ew kesên ku dibêjin! Ev gotina jî wiha nîye belkî beşavenda wê jî her heye, ewqasî heye wek huner û helbestên kevn xwe bi wan peyvên ku li dawîya helbestên xwe da bikar bîne girê nedaye belkî li ser şêweyeke tazetir çûye ku bi girtina vê rêyê ve helbesta wî ciwantir bûye" (Secadî, 1968, pp. 317-318).

Kewate (yanî) Secadî wiha dirame (difikire) ku beşavenda van helbestana heye lê beşavenda wan ne teqlîdî ye, belkî awayekî azadîyê di bikaranîna beşavenda wê da heye ku helbestvan bi tu destûreke taybet ve girê nedaye û zanîbû di ku da bi ciwanî û pêwîstî bi beşavendê heye anîye.

Di derbarê vê helbestê da Refîq Hîlmî dibêje: " Li ser şêwaza Tofîq Fîkret danîye" (Hîlmî, Şî'r û Edebyatî Kurdî, 1988, p. 200).

Di derbarê kêş û beşavenda muzîka (awaz) helbestê Refîq Hîlmî dibêje: " Awayê şeweyeke dilgîr û ahengek mosîqî ya şîrîn jê peyda kirdûn, bi kurtîya wê çele si lû baweçe li ewezin û beşavend ahenga şewazeke nû ji bo helbestê danîye" (Hîlmî, Şîr û Edebyatî Kurdî, 1988, p. 200).

3.2.3 Nûvekirina Beşavenda Mustezadan

Dema ku behsa hunera helbestên nû hatkirin me behsa mustezadê kir. Di vir da emê li rûyê cûre bi cûreyê beşavendan ve li ser mustezadan vekolînê bikin.

- Di mustezada ‘‘Be min billê le mîlletê’’. Ev helbesta di ‘esil da mesnewî ye (a a) û ji bo her dêrek (rêz) wê parçeyek hatîye zêdekirin û hemû parçeyên wê hevbeşavend in û pêwendîya wan bi beşavendên dêrên pêş xwe ve tune. Tenê di dêra yekem da ku ji bo (tîsrî) parçeyê wê digel beşavenda dêra wê da hevbeşavend in.

- Lê di mustezada ‘‘Esker’’ da, beşavenda parçeyên zêde her wek beşavenda nîvrêzên pêş xwe ne. Di vir da beşavenda her parçeyî ji beşavenda parçeyên din cudatirin û wek beşavendên rêzên pêş xwe ne. Di vê mustezadê da her parçeyek li dawîya (dû) çar nîvrêzan hatîye û her pênc hevbeşavend in.

- Di mustezada ‘‘Nameyekî Şîrî – Le Şêx Nûrîyewe Bo Zêwer’’ da li dû her dêrekê, du nîvdêr û parçeyek hatîye ew jî li rûyê beşavendê ve her wek beşavenda nîvdêrên peşîyê ne û hevbeşavendî di navbera parçeyên wê da tune.

Guherîn û azadîyeke din ya beşavenda vê mustezadê ew e ku beşavenda parçeyan hinek car wek beşavenda nîvdêra yekem ya dêra pêş xwe ye:

Ey badî seba peykî xeyallatî edîban a

Ey mîrwe’heyî fênîkî zamî dillî sûtaw b

Ey badî xerman (‘Ebdalwahid, 1985, p. 103). a

Yek caran jî di hinek cî da beşavenda parçeyê digel beşavenda nîvdêra duyem ya pêşî yek digre(yek tégirtin):

Em nameye ciwan bigre be destêkî bilûrîn a

Razawetewe, çünke be mîhr û mehm û exter b

Eynen weku efser (‘Ebdalwahid, 1985, p. 104). b

Li hinek cihê din da jî beşavenda parçeyê wek beşavenda her dû nîvdêrên pêş dibe, wate beşavenda her sêyan (du nîvdêr û parçeyê wê) yek e:

Seyrî bike binwarre be şar û be kenara a

Dewrê bide nextê le demî êw subhî behara a

Ey badî dillara ('Ebdalwahid, 1985, p. 104). a

Bi vî awayî em dibînin nûvekirina Şêx Nûrî tenê ne bi wê ye ku li dû du nîvdêrî îjar parçeyek zêde kirîye, belkî destûra beşavenda kevn jî şikandîye û her carê bi awayekî (cûreyekî) beşavenda parçeyê û beşavenda du nîvdêrên pêşî anîye.

Ev ji wê pêk tê ku xwe bi destûr û bendên taybet ve girê nade û di anîna beşavendan da azad e, nûvekirina wî bi taybetî di beşavenda mustezadan da û bi şeweyekî giştî jî di helbesta kurdî da xwedî erk û bandoreke giring e.

- Di mustezada "Rutbey 'Ezemet'" da, parçeyê zêde li dû çarîneyekê anîye, beşavenda her çarîneyê jî diguherin; beşavenda çarîneya yekem muserre'e û hevbeşavend e (a a a a), beşavenda çarîneyên duyem, sêyem û pêncem bi dorê ye (a b a b) û beşavenda çarîneya çarem jî dibe hevbeşavend.

Di hemû çarîneyan da jî beşavenda parçeya zêde digel beşavenda nîvdêra dawîyê (kotayî) çarîneya pêş e yek têgirtin wek: -

Rutbey 'ezemet layîqî zatêke bizanê a

Wek xo şî dezanê û bizanê ke dezanê a

Nek layîqî şexsêke, nezanê û nezanê a

Nazanê ewe xoşe be lay xellqî cîhanê a

Bêsûd û zîyanê ('Ebdalwahid, 1985, p. 112). a

Yan jî wek:

(Bî) talle eger şeker û şehdî be serakey a

Neşey nîye, her siwallete sed pirr bê le bade b

Çîleke çî ye ? Ba kurtekî sewzî be berakey a

Ger 'aqlîy lem jîne bê qîmete lade b

Em kibîre be bade ('Ebdalwahid, 1985, p. 112). b

Ji bilî vê, nûvekirin û derçûneke din ya ji destûrê (xwe negirêdana bi destûrê) ew e ku li paş çarîneyekê (çarîneya duyem) li şûna zêdekirina yek parçeyî du parçe zêde kirîye:

Nabê munewwer be gullî yexeyî çaket	a
'Ummanî serab, bûnî be deryaçe me'halle	b
Zerd rûkeşî zîwîşî bibê, nayete qîmete	b
Î'lanî 'ewaris, weku îsnadî xeyalle	b
Tab' bez û alle:	b
Wek şewqî tepalle ('Ebdalwahid, 1985, p. 111).	b

Bi van mînanan ve dîyare ku Şêx Nûrî gelek nûvekirin li beşavenda mustezadan da kirîye, azadîyeke temam wergirtîye di beşavenda parçeyan û nivdêran da. Çawa xwestibe wiha darijtina helbestên xwe kirîye, nexwestîye tu destûrî li ser xwe ferz bike.

3.3 Wêneyê Helbestî:

Di rexneya nû da gelek giringî û pûteya (bayex) wêneyê helbestî heya çimkî erka wêneyê helbestî di dahênana helbest û veguhestina hest û soz û kelecana xwendevanan da cihekî giring digre û hest û soza xwendevanan dicoşîne.

Peyva "Image" ku "wêne" ye ku wek "imagination" e ew jî wateya "xeyal" dide. Çimkî xeyal wêneyan çê dike û dike şênberî (berceste) mirovan, xeyal ji çalakîya mêjî pêk tê ji bo çêkirina wêne û darijtina qalibên helbestî.

Herwiha xeyal li dû hêmanên wêne digere û şîroveya wan dike û wêneyan jê pêk tîne, çêbûna wêneyê helbestî wê demê dest pê dike ku "hestên wêneyê ji bo mêjî dişîne, xeyal hewlê dide wan hêmanan ji bonê amade bike ku digel wan da rêk dikevin wek bîr û peyvê, divê rêkxistina ew bîr û peyvan bi şeweyekî dahênerane bin" ('Esfur, 1974, p. 18).

Li gor hinekan sê pênaseyên wêneyê heye:

- Wêne her tişte ku em dikarin bibînin, bibihîzin, bêhn bikin yan dest lê bidin û ta'm bikin. Wate her tişteki bi ber hestên mirovan bikevin.
- Wêne vegotîneke (gêranewe) zîhnî ye ji bo tişteki hestpêkirî (tiştên ku em hest dikin), wekemînak ; ku li malê ez guhdarîya çîv çîva çûçikan (cirîwey çoleke)

dikim, çûçikek candar tê berçavê min, herwiha hêlîneke li ser şaxê darê jî tê berçavê min.

- Wêne dîmeneke ku ji peyvên hatîye holê (çêbûye) ('Ebdelrehman, 1979, pp. 66-67).

Dîyare hêmana serekî ya wêneyê helbestî "peyv" e, çimkî " ziman, peyv û deng di nav tiştên mirovî û nemirovî da hevbeş in. Di vir da pêwendîya di navbera avahîsazî (bînasazî) û wêneyê helbestî da ev e ku ev hêmanên wêneyên xwe ne " (Se'îd 'Elî Se'îd El Deylemî, 1990, p. 29).

Loma erka mezin ya ziman, peyv û deng heye di xurtkirin û çêkirina wêneyê helbestî da û îhay bihêz didin "Belgeya wênekirinê ew e ku gelek daxwaza helbestvan di xeyalbazî û vejîna wêneyên xezinkirî yên nav bîrewerîya xwe da heye ku yasayê tedarî reha deyrûjênê " (Xerîb, 1981, p. 202).

Bêguman ew tedarîya jî bi gelek sedeman tê holê û yek ji ew hêzên peyvane ku ji liv û lebata paşxana xezinkirîyê ve tê, ji berê da tê gotin "peyv peyvê dikşîne".

Materyalên helbestê peyv û deng e ku bi hoya wan ve ew wêneyên li ba xwendevanan dibe sedema coş û kelecane li ba her xwendevanî cuda ye û diguhere. Çimkî deq bi deq wek xwe naveguhezî belkî ev îha ye û bandorê li xeyalên me dike" (Esmê'îl, 1968, p. 358) ramana kevî yê di derbarê wêneyan da ew bû ku " wêneyê helbestî tenê ji lihevçiwandin (lihevşibandin) û xaze (xwastin, îstîfara) pêk tê kur amana nû vê çarçeweyê berfirehtir dike. Armanca di vir da di derbarê wêneyan da tenê ne wêneyên rewanbêjî ye herwiha dibe ku bi wateya nû tu xaze têda nebe û peyv û komên peyvên bi wateyên xwe yê resen bikar hatibin digel wê da jî wêneyekî çê dikin ku belgeya xeyalek xurt e " (Betel, 1981, p. 25).

Gelek şax û beş ji wêneyê helbestî hatine holê...wek; wêneyê hestî û wêneyê zîhnî, wêneyê hestî bi pê hestên mirovan diguherin ew jî ; wêneyê livî (lebatî), wêneyê rawestî, wêneyê sade, wêneyê tevlihev, wêneyê girêdayî (pêwendîdar) û wêneyê reha.

Helbestvanên kurd her ji demên berê da awir li wêneyê helbestî dane. Helbestên klasîkî yê kurdî tijîne ji wêneyê rewanbêjî ku di lihevçiwandin û xazeyê da derdikeve. Gelekê wan wêneyan jî dúbare ne û helbestvanan zarîkirina (teqlîd) hevdu dikin û her

heman wêneyan dúbare dikin lê ji bo armancên cuda û di cî û helwestên (tevger) cuda da bikar tînin.

Lê helbestvanên nûxwaz bi taybetî pêşengên nûxwazîyê hewl didan ku xwe bi zarîkirina wêneyên klasîkî ve girê nedin. Belkî bi xwe wêneyên cûr bi cûr û xwedî mijarên nû dirust dikirin.

Ew wênêyên ku helbestvanên nûxwaz anîne; yan ji helbestên klasîkî wergirtine û bi wan bi xwe careke din bi şeweyekî nû ve darijtine yan ji çand û kelepûra neteweyî wergirtine yan jî li jêr bandora wêjeya biyanî dahênane ne yaxud bi xeyalên xwe ve wêne dirust kirine.

Şêx Nûrî ku yek ji helbestvanê pêşeng yê helbesta nû ya kurdî ye, di vî warî da gelek dahênan û nûvekirin çêkirîye û gelek wêneyên xurt û bihêz dahênaye, vê jî digel hêmanên din yên pêvajoya nûvekirinê da bi gur û xurtî dirust kirîye û çarçeweya giştî ya nûvekirinê berfirehtir kirîye

3.3.1 Wêneyê Hestî û Wêneyê Zîhnî:

3.3.1.1 Wêneyê Hestî

Ew wêne ne ku bi hestan (hestên mirovan) tê derkirin."Dirustkirina wêne, bi taybetî wêneyê hestî tomarkirineke fotoxrafi ya siruştê yan zarîkirin nîye, eşkereye ku helbestvan bi hoya hestên xwe ve dikeve nav kûrahîya siruştê, dîmenên hûr û nazik dibînin lê wek xwe çawane wiha venaguhezînin. Belkî dixin jêr destkarîya xwe û ew wêne dibin wêneyên ji bîr û soza helbestvan, ne wêneyên rût û serbixwe ne "(Betel, 1981, p. 31).

Wêneyên hestî hemû hestên mirovan digrin û her bi rêya wan hestan ve cîhana derveyî têveguheztin nava mirovan, li paş guherîn û dirustûnê dúbare bi şeweyê wêneyekî îbdaî tê derve.

3.3.1.2 Wêneyê Dîtinê (bînîn)

Hesta dîtinê li ser hemû hestên din e, ji bo dîtina ew materyalên ku dikarin wêneyên hunerî ji wan berhem bîne (were holê, çê bibe)."Dîtin hûrtirîn û temamtirîn hest e, gelek bîr û ramanên cûr bi cûr dibexşîne ji bo heşê mirovan û ji dûr ve riştan havil dike (deqozêtewe) " (Betel, 1981, p. 31).

Pêvajo (mewda) ya wêneyên dîtinê ji ya hestên din berfirehtir e, çimkî "pirranîya tiştên maddî bi çav têne dîtin, loma ev hesta wek dayika hestan tê danîn. Wêneyê dîtinê, reng, biriqîn, dûr û nêzikîya tiştên berçav li xwe digre (têda hene) " ('Ebdelrehman, 1979, p. 22).

Şêx Nûrî gelek wêneyên dîtinê yên hûrgil (wird) û dahênane berhem anîye ku şeweya nûvekirinê têda xuya dike, çimkî teqlîda helbestvanên pêş xwe nekirîye.

Wekemînak:

Bîrî wird û me'anîyê taze

Le semay şî'rma, hîlalî min e ('Ebdalwahid, 1985, p. 322).

Di helbestên klasîkî da bi pirranî "hîlal" ji bo "birû" bikar hatîye ji ber wê ku şeweyên wan wek hevdu ne, lê di vir da ji bo ramana hûrgil û wateyek nû bikar hatîye. Bîrş wirdekanî wek hîlalê biçûkin û dikare vî wêneyê nû bîne berçav. Ev wêne çiqasî wêneyekî rewanbêjî be jî (lihevçiwandin) lê ji bo armançê nû (teze) bikar hatîye.

Yan wek:

Dîsan le ême qapîyekey xem kirayewe

Dergay tereb le 'alemî dill daxrayewe ('Ebdalwahid, 1985, p. 145).

Di vir da jî dîsa hinek wêneyên dîtinê hene wek: qapîy xem (derîyê xemê) / dergay tereb / 'alemî dill.

3.3.1.3 Wêneyê Bihîstinê

Ev wêne bi hemû rewş, şeweyê û cûreyên xwe ve "deng" li xwe digre. "Pileyî: bilindî (berzî) û nizmî, cûreyî: guherîna dengên amûrên muzîkî, bilindî: gurrî û kipî, arasteyî: pişt û pêş û tenîşt û dûrî. Herwiha cûreyên dengî yên muzîkî bi şeweyekî rîtim, awaz, hevahengî û bi şeweyê lêdan û kutanê **lerînewe** vediguhezîne " ('Ebdelrehman, 1979, p. 67).

Di vê rewşê da awaz û deng wêneyê xwe di zîhna xwendevanan da diteqîne. Şêx Nûrî demekê ku bulbul dide axavtin daxwazê lê dike here Kerkûkê û rasipêrîya xwe bigîne

(bigêjîne), wêneyekî bihîstinê ji lêdana baskên bulbul dirust dike ku xwendevan bi guhên xwe ve hest bi dengê baskên bulbul dike:

Bide le şeqey ballî nerm û sûk

Birro ta çemî xasey naw Kerkûk ('Ebdalwahid, 1985, p. 193).

Di vir da bi başî em hest ragirin dengê şeqîna nerm û sivik ya baskên bulbul tê guhê me ku bê dîtîne em hest bi firîna bulbul dikin.

Herwiha dibêje:

Hemû xakî be carê her qum û lîmêkî bê awe

Ne xişpey mar û mêrûle ne wirşey ballî balldarî ('Ebdalwahid, 1985, p. 234).

Bi guh ve hest bi xişpeya mar û gêreyan û ewrengîya (wirşe) baskê baskdaran tê kirin.

3.3.1.4 Wêneyê Destlêdanê

Her çiqas jê re dibêjin ‘destlêdan’ lê hemû çermê mirovan hest bi wê rewşê dike, ji ber ku hêza vê hesta mirovan zêdetir di dest da kom bûye û ev kara zêdetir bi dest encamê dide ". Ev jî ji ber berhevketina fişara (pesto) nazikîya dar, hesin, hewa, gaz û şile .Digel tundî û awayê berhevketina zibrî? û lûsî û reqî û nermî ...û berhevketina zamdarkerî wek tîjî, germayî, lîncî û şillî ... pêk tê" ('Ebdelrehman, 1979, p. 68).

Ev gelek car di helbestan da dûbare dibe û helbestvan sûdê kê digrin ji bo çêkirina wêneyên helbestî wiha guzarîştê (ta'bir) li rewşên bi wî awayî bikin.

Şêx Nûrî dibêje:

Cêy nûstin û rahetî le naw narabê

Nek padşehî, lesifî exyara bê ('Ebdalwahid, 1985, p. 220).

Hestkirina bi şewitandina agir bi rêya hesta lêdan û berhevketinê dibe.

3.3.1.5 Wêneyê Bêhnkirinê

Ew hest e ku bi rêya ‘poz’ (kepû, lût, difin) ve li cîhana derve da hest pê tê kirin û wêneyê bêhnkirinê di mêjî da derdixe holê." Wek bêhna mewe, çêj, gul, mîsk, xaz, bêhna tiştên şewitî wek qahwe, titûn û herwiha bêhna ajel û paşmayîyê wan... Hwd " ('Ebdelrehman, 1979, p. 68).

Şêx Nûrî gelek wêne dirust kirîye ke bi bêhnkirinê hest bi wan tê kirin û zêdetir ew bêhna siruştî ya bihar, payiz û zivistanê di wêneyên xwe da bikaranîye.

Di mînakekê da dibêje:

Wa behar hat û hewa xalî ye, sayî çemen e

Nefesî badî seba, nafeguşayî çemen e (Ebdalwahid, 1985, p. 206).

“Xalî ye, nefesî badî seba û nafeguşayî çemen” ew wêne ne ku hesta bêhnkirinê çêkirine û wêneyê bêhnkirinê di mêjîyê xwendevanan da dilivîne û dicoşîne.

Herwiha dibêje:

Her xunçey sîsî dillî kurdane dellê key

Ekrême we rojî be hewayêkî mu'tter (Ebdalwahid, 1985, p. 305).

Di vir da jî pêwendîya “vekirina xunçe” û “belavkirina wê ya bêhneke xweş” bi hesta bêhnkirinê ve heye.

3.3.1.6 Wêneyê Çêjkirinê

Ev hesta jî pêwendîya wê bi çêjkirinê (ta'mkirin) heye û hêza hesta çêjkirinê bi pirranî li serê zimên, ezmanê dev û di nav dev da kom dibe, hestkirin jî bi çêja tişteki dibe wek berhevketin (temas), divê berhevketina maddeyê bi cihê (şûna) çêjkirinê ve hebe ku ziman û dev e.

Wêneyê çêjkirinê ew e ku bi hoya hesta çêjkirinê ve hest pê tê kirin, wek ; "şîrîn, tal, tirş, şor û çêjên tevlihev jî digre..." (Ebdelrehman, 1979, p. 67).

Şêx Nûrî awirek daye vê hesta jî û hinek wêneyên ciwan pê çêkirîye, wek:

Be roj pûş û pelaş û zî bimallî

Be şew ta wextî sibheynê binallî.

Binoşî dem be demzûxaw û tallî

Ne wek bêgane bê û rû keyte mallî (Ebdalwahid, 1985, p. 220).

Vexwarina “zûxaw” û “tallî” yê bi ber hesta çêjkirinê dikevin.

3.3.2 Wêneyê Zîhnî:

Ev wêne li hemberî (digel, pê re) wêneyê hestî ye ku bi ber yek yan ji yekê zêdetir hestan dikeve û hinek wêneyên zîhnî hene ku wêneyên watayî ne û hewqas pêwendîya wan bi hestên mirovan ve tune. Eger ew wêneyê ku di mêjî da ye ji derve hatibe nav mêjî, ev wê derdixe ku wêneyê zîhnî tişteke wek di rastî da heye. Wêneyê zîhnî û waqîî ya

(ketwar)dar, birûsk, gul, xwerûk û qumaş lihev diçin (dişibin hev) " (Serwer 'Ebdelrehman 'Ebdella, 1996).

Lê eger wêneyê hestî zêdetir rû bike derve ji bo pêkhatayan, wê demê wêneyê zîhnî zêdetir rû dike nav (hundurê) mirovan ji bo pêkhate û şîrovekirina wêneyê di mêjîyê mirovan da. "Wêneyê zîhnî berçavkirina hest, soz, daxwaz û bîrên (raman) mirovan e ku ew jî olana (dengvedan) bandora derve ne ku wêne bi agahdarî ve hatibe yan bê agahdarîyê hatibe yan jî di encama tevlihevbûna herduyan hatibe.

Kewate wêneyê zîhnî ji nava (hundurê) mirovan da derdikeve holê û xwe bi xwe diçespîne, rewşeke ji "awayekî wêneyan çê dike ku bi ber tu hestên mirovan nakevin, ew jî wêneyên watayî ne ku ji wêneyekî zîhnî yê rût pêk tên, yaxud wêneyekî jîrî ye ku tenê bi jîrî em dikarin tê bigihên (jê fam bikin).

Şêx Nûrî gelek wêneyên zîhnî yên cûr bi cûr di helbestên xwe da bikar anîye û bi hoya wan ve guzarîşt (ta'bîr) li hest û sozên coş û kelecane dike.

Wekemînak di rêzek helbestê da dibêje:

Eme bo to bese bo berzî xullqit be dewam

Wîrdî roj û şewî em 'aleme ye wesf û sen'et (Ebdalwahid, 1985, p. 267).

Di vir da 'berzî xullq – wîrdî roj û şew=avzûna roj û şevê' wêneyê zîhnî ne û Şêx Nûrî di helbesta xwe da ew bikar anîne.

3.3.3 Wêneyê Rawestayî- Wêneyê Livî (Lebatî):

Ev cûreyên wêneyê li gor tevgera nav hêmanên pêkhatayên xwe du cor e, wêne yan rawestayî ye yan jî liv têda heye.

3.3.3.1 Wêneyê Rawestayî:

Ew wêne ye ku di rewşeke rawestayî da ye û têda hest bi lebatê nayê kirin. Wêneyê rawestayî ew wêne ye ku "xêzên wê çespawe (diyarkirî) û pêşketin têda tune ye " (Baqî, 1985, p. 61).

Liv (lebat) jî zêdetir di kar da derdikeve loma di wan cûreyên wêneyan da kar (tevger) belkî rewşa ku têdaye di kurdya ? bi fermana bêhêz navê wê tê.

"Em dikarin wêneyê rawestayî (westaw) biçwînin (bişibînin) tabloyekê ku rewşek wê ya rawestayî heye û tenê alîyekî dixê rû (alîyek tenê dîyar e). Wêneyê rawestayî tîrêjê (tîşk) nade tu (hîç) tevger û lebat têda tune " (Gerdî S. A., p. 119).

Şêx Nûrî Şêx Salih di nav helbestên xwe da bi taybetî ew helbestên ku dikevin nav rêça nûvekirinê gelek wêneyên rawestayî bikar anîye ku guzarîştê li rewşên cûre bi cûre dîkin.

Wekemînak:

Be qanûnî ême wa ye

Zîndan cêy aştiy Xwa ye ('Ebdalwahid, 1985, p. 175).

Di vir da digel peyva 'zîndan' yekser wêneyekî rawestayî tê berçavê me ku çar dîwar, menzelek (ode, jûr) biçûk û tarî û cihê azar û îşkenceyê ye.

3.3.3.2 Wêneyê Livî (Lebatî):

Wêneyê livî berevajîyê (pêçewane) wêneyê rawestayî ye, çimkî hest bi tevgerekê tê kirin ku ew jî dîyare ji kar hatîye, ev cûreyê wêneyan di rewşa lebatê da ye." Wek çûyin, xawrin, nivîsandin, stran, çinîn û tevgerên ku ji bo berevanîyê tînan bikaranîn wek; girtin, jêkirin, derkêşanî ,pê piyanan, rakêşan û rawestandina li dû lebatê jî digre wek rûniştin û rawesta ('Ebdelrehman, 1979, p. 68).

Her liv û tevger jî di encama ajoyeke (pallner=bi tirkî güdü) derekî da peyda dibe û " ji kar û bertekên (kardanewe) di nav û dijî tiştan pêk tînan " (Casim, 1970, p. 29). Kewate wêneyê livî " wêneyekî dînamîkî ye ku îha û berdewamî têda ye û olandana watayî têda tu carê ranaweste " ('Elî, 1995, p. 138).

Ev jî resenîya ('eslîbûna) hemû maddeyan e çimkî " dîyare lebat tenê taybetîya çalak ya binyata wêneyê jîyanê ye û her lebat jîyan û mirinê ji hev cuda dike" (Gerdî S. A., p. 122).

Şêx Nûrî yek e ji ew helbestanê ku bi radeyeke pîrr wêneyên livî bikar anîye û gelek car ew liv û tevger berdewam dibe bi awayekî ku gelek wêneyên din li dû xwe radikîşîne wek xeलेkek dîmenî ya berfireh ku gelek liv û tevger tîne holê.

Wekemînak:

Beroj lem gull bo ew gull

Lem çillewe bo ewçill.

Efirî û enîşêtewe

Bonî xoş eçînîtewe ('Ebdalwahid, 1985, p. 335).

Di vî wêneyî da yekser dîmenekî tijî liv û bizav tê berçavê me ku ‘‘firîn û venîştina pilpilîngan’’ e û di nav baxçe da ji ser vê gulê difire ser wê gulê û ji ser vî şaxî difire û diçe ser wî şaxî.

Di vir da bizav û lebata pilpilîngan di navbera ‘‘firîn’’ û ‘‘venîştin’’ ê da ye, ku bi vî awayî din av baxçe da dizîvirin û bi roj heta êvarê bêhna xwe venadin ku ev tevgera vegustine û berdewam e.

3.3.3.3 Wêneyê Tak û Wêneyê Tevlihev:

Wêneyê helbestî bi pê wê çarçeweya ku têda derdikeve dikare yek wêne be, îjar çî rawestayî û çî livî be. Dibe ku ew wêne ji komek wêneyên pirralî (hemelayen) tevlihev bûbe û yekcaran wiha ye wêneyê tevlihev giştîya helbestê digre û ji serî heta dawîya helbestê ji yek rêzewêneyên bi hevdu re tewandî û tevlihevîyek di nav hevdu da pêk hatîye ku livek berdewamî ya hemûyan digîne hev û tevgereke dramayî pêş dixê û bervî temambûnê diçe.

➤ Wêneyê Tak:

Ev cûreyê wêneyan li rûyê pêkhatinê ve wek sadetirîn wêne tê danîn (tê qebûlkirin) çimkî dîmeneke biçûk û serbixwe dixê berçavê xwendevanan. Şêx Nûrî bi kûrahî ev wêne di helbestên xwe da bikar anîne û zêdetir xistîye berçav.

Wekemînak:

Heqîye felek be carê serî xoy le xom binê

Bigrî felek be şînewe bo em mûsîbetewe ('Ebdalwahid, 1985, p. 386).

Yek wêneyê tak di vê helbestê da hatîye, ew jî ‘‘ser le xom nan û şîn gêranî felek’’ .

➤ **Wêneyê Tevlihev:**

Di vir da bi şeweyê kar û bertek (kardanewe) rêzewêneyek li dû hevdu da tîn. Ji serî heta dawîyê yan hoy (sedem) û encam yan tamamker û tamamkir yan qewde û şax berdewam dibin û tevlihev dibin û hevdu tamam dikin herwiha hevdu **neş** û nima dikin û di dawîyê da jî dîmenekî tijî tevger û liv çê dike xwendevan ku di (ke le medayekî) cihî (mekan) yan demî da xwe derdixe.

Wekemînak Şêx Nûrî di helbesta ‘‘Hênanewey Cenazekey Şêx Mehmûd= Anîna Cenazeyê Şêx Mehmûd’’ da her ji serî heta dawîya helbestê bi şeweyekî çîrokî û bi rêya çêkirina komek wêne ve bûyera ‘‘Anîna Cenazeyê Şêx’’ û bobelatên wê demê yên li Silêmanîyê dixê berçavan.

Herwiha di ‘‘Karwanî Jîyan’’ (Ebdalwahid, 1985, p. 234) da ku xewneke û bi çîroka helbestî ve vedibêje gelek wêneyên cûr bi cûr anîye ji bo çêkirina dîmena helbestê, pêwendîya hemû wêneyan pîrr yan kêr bi hevdu re heye û bi şeweyekî dînamîkî tevdigerin û tevlihev dibin û bervî pêşîyê ve diçin.

ENCAM:

Di dawîya vê vekolîna ‘*Tazekirina Helbesta Kurdî Li Ba Şêx Nûrî*’ da em gihîştin çend encaman ku yên giring ev in:

1- Şêx Nûrî bi helbestan ve danûsendin digel hinek mijarên civakî da kirîye ku pêştir bi vî awayî danûsendin nehatine kirin, wek; mijarên zanistî û zanyarî, aborî û debara gel, yan pirsgirêka jinê ku wê demê bibû pirsgirêkek gelekî giring.

2- Şêx Nûrî hem wek rexnegirekî wêjeyî û hem jî wek helbestvanekî dahêner di her du warî da awirekî baş daye hunera mustezadê û dahênanên cûr bi cûr têda kirîye li rûyê kêş û beşavend û parçeyên zêde da. Tiştên wiha dahênaye ku pêştir di mustezada klasîkî ya kurdî da nebû.

3- Yek ji ew mijarên nû ku Şêx Nûrî anîye nav helbesta kurdî operê e, lê gelek gengeşî li ser wê heye ku gelo ew operêta di dîwana wî da heye ya wî ye yan ya Bêxud e, yan dahênan e yan jî wergerrîn e?, ev ji bo helbesta kurdî ya wê demê tişteki nû bû.

4- Helbestên klasîka kurdî yên zaravayê kirmancîya bakûr û jêr (xwarû) bi kêşa 'erûzî dihatin nivîsandin, Şêx Nûrî di vî warî da dahênan û nûjenî (tazegerî) ya xwe kirîye ; yek ji wan tevlihevkirina kêşa 'erûzî û kêşa kîteyî ye, yek jî vegeerîna ser hinek cûreyên kêşa kîteyî ya resenên kurdî ne wek; kêşa heft kîteyî, kêşa heşt kîteyî û kêşa deh kîteyî.

5- Beşavenda helbestê warekî din e ku Şêx Nûrî têda gelek dahênan kirîye, di helbesta kurdî da yekîtiya beşavendê dihate qebûlkirin, digel vê da jî mesnewî ji bo helbestên dirêj heye û digel çarîne jî Şêx Nûrî di dabeşkirina beşavendan da dahênan cûr bi cûr kirîye. Di çarîneyan da gelek dabeşbûna beşavendan li jêr bandora helbestvanên tirk anîye ku pêştir di helbesta kurdî berçav nakevin, wek; çarîneyên petrarkî, çarîneyên şexspîrî û çarîneyê baladî.

Herwiha li gor pêncîne û şeşneyan jî ji bilî ku hinek helbestan da mesnewî ji bo xezel û qesîdeyan bikar anîye ku ev jî di çavê helbesta klasîkî da nû ye.

6- Li rûyê zimanê helbestê jî, derdikeve ku Şêx Nûrî di hîlbijartin û bikaranîna peyvên da di sê qonaxan da derbas bûye:

Qonaxa Yekem: Peyv û komên peyvên û zimanê helbesta klasîkîya kurdî ku zarîkirina helbestvanên pêşî yên kurd e.

Qonaxa Duyem: Bikaranîna peyvên osmanî ku bi pirranî peyvên'erebî û farisî ne lê bi awayê darijtineke taybetî ev peyv û komên peyvên li ba helbestvanên din yê hevdemên Şêx Nûrî jî derdikevin, ev peyvana li jêr bandora helbestvanên tirk ve hatine nav helbesta kurdî.

Qonaxa Sêyem: Bikaranîna peyvên resen û xwerû yên kurdî ye û ku ji çanda neteweyî hatine wergerandin.

ÇAVKANÎ

'Ebdulhemîd, M. H. (1975). El Edeb El Turkî El 'Hedîs û El Me'esr. Misr: El Hîye El Misrîye El 'Ame El Kitab.

'Ebdulreuf, M. ' (1977). El Seqafiye We El Eswat El Luxîye. Misr: Mektebe El Xanesî Bimser.

'Ebdelrehman, D. (1979). Fî El Neqd El 'Hedîs. Eman: Mektebe El Eqesî.

Aşna, U. (2002). Goran. Hewlêr: Çapxaneya Wezaretê Perwerde.

Azad 'Ebdulwahîd. (1985). Dîwana Şêx Nûrî Şêx Salih, Berga 1., Beşa 1. Bexda: Çapxaneya Dar El Ca'hiz, .

Azad 'Ebdulwahid. (1989.). Şêx Nûrî Şêx Salih (dîwan) berg1, Beşa 2. Bexda: Çapxaneya Dar El Ca 'hiz.

Baba Tahîr, ,. W. (1970). Tiranehay Baba Tahir. Taran: Çap û Întişarat Cawîd.

Baqî, N. E. (1985). Teswîr El Sure El Fenîye fî El Şî'r El 'Erebî. Dîmeşq.

Bekir, D. M. (1999). Ebdurehîm Rehmî Hekarî,. Kovara Zanîngeha Dihokê , 6.

Bekir, D. M. (1998). Sîmayên 'Erûza Qonaxa Veguhestina Helbesta Kurdî. Kovara Zanîngeha Dihokê , 1.

Berzincî, ' M. (1978). Karwanî Şî'rî Niwê û Çepkêk Serinc. Beyan , Jimare 60.

Besîr, D. (1980). Şêx Nûrî Şêx Salih Di Sazîya Wêje û Rexnesazîya Kurdî da. Bexda: Çapxaneya Korî Zanyariy 'Êraq.

- Betel, D. ' (1981). El Sure fî El Neqd El 'Erebî, Dirase fî Eswelha û Teswîrha. Dar El Endeles.
- Bîmar, E. (1970). Danîştinêk Legell Goran. Kovara Beyan , 2.
- Bîmar, E. (1979). Edebî Niwê û Niwêxwazî. Beyan , 34.
- Casim, E. E. (1970). Dirasat Neqdîye fî El Edeb El 'Hedîs. Bexdad: Dar El Cemahîr.
- Celalî, M. M. (1984). Şêx Nûrî Dengê Resen yê Helbestê. Bexda: Dar El hurîye El tab'e.
- Cemal Xeznedar, ,. ,. (1974). Bangî Kurdistan. Bexdad: Çapxaneyaya Dar El 'Hurîye El Teba'e.
- Dr. Es'ad 'Ebdulhadî Qendîl, ,. s. (1975). Finun El Şi'r El Farisî, Ç 1,. Mekteb El Şerîf we Se'îd Rafet.
- Dr. 'Îzeddîn Mistefa Resûl. (1989). Wêjeya Nû ya Kurdî, . Hewlêr: Çapxaneyaya (El Ta'lîm El 'Alî).
- Dr. Kamîl Besîr. (1980). Şêx Nûrî Şêx Salih Le Korî Wêje û Rexnesaziy Kurdî da,. Bexda: Çapxaneyaya Korî Zanyariy 'Îraq.
- 'Ebdulwahid, A. (1985,). Dîwana Şêx Nûrî Şêx Salih, Berga 1., Beşa 2. Bexda: Çapxaneyaya Dar El Ca'hiz.
- Ehmed Taqane. (2001). Tofîk Fîkret û Helbestvanên Nûxwazên Kurd,. Hewlêr: Çapxaneyaya Perwerde.
- Eladdîn Secadî. (1968). Edebî Kurdî û Lêkollînewe Le Edebî Kurdî. Bexda: Çapxaneyaya Me'arîfe,.
- 'Elî Nacî Kake Heme Emîn 'Etar û Sîrwan Bekir Samî, ,. (1998). Yekemîn Rojnameya Silêmanî,1920-1922. Pêşkewtin , 30.
- 'Elî, T. M. (1995). El Delale El Şi'rîye 'End Îbrahîm Nacî. Camî'e Selaheddîn, Rîsale Macester.
- 'Esfur, D. E. (1974). El Sure El Fenîye fî El Teraş El Neqdî wel Belaxî. El Qahîre: Metbe'e Dar El Seqafe.
- Esme'îl, D. (1968). El Las El Cemalîye fî El 'Erebî. El Qahîre: Dar El Neşr El Teba'.
- Felah, K. (1978). Karwanî Şî'rî Niwêy Kurdî,. Bexda: Çapxaneyaya Korî Zanyariy Kurd.
- Gerdî, E. (1999). Kêşî Şî'rî Klasîkî Kurdî. Hewlêr: Çapxaneyaya Roşinbîrî.
- Gerdî, E. (1999). Serwa. Hewlêr: Çapxaneyaya Roşinbîrî.
- Gerdî, S. A. Binyatî Wênay Hunerî Le Şi'rî Kurdî da (1970–1991).
- Harîsê Betlîsî, ,. A. (1985). Leyla û Mecnûn. Moskowa.

- Hejar. (1361). Dîwana Melayê Cizîrî. Taran: Çapxaneyaya Siruş.
- Hîlmî, R. (1988). Şî'r û Edebîyatî Kurdî. Hewlêr: Çapxaneyaya El Ta'lim El 'Alî.
- Humayî, U. ' . (1377). Finun Belaxat û Sena'et Edebî. Taran: Mosse Neşirham.
- Kerîm, M. M. (1970). Dîwana Bêxud. Bexda: Çapxaneyaya Selman El 'Ezmî.
- Kerîm, M. M. (1970). Pêdaçûneweyêk Be ''Dilaweran'' î Dîwana Bêxud da,. Beyan , 1.
- M. Nûrî, ,. ,. (1926). Ew Qewa'idey Ke Uslub Tabî'iyetî. Jîyan , Jimare 42.
- Melaîke, N. E. (1967). Qise El Şî'r El Me'esr. Beyrut: Metbe'e Dar Îltîzamen.
- Melaîke, N. E. (1993). Saykulucîye El Şî'r û Meqalat Axirî. Bexdad: Metbe'e Dar El Şiwîn El Seqafe El 'Ame,.
- Mihemmed Elensî, ,. ,. (1318). Qamus El Luxe El 'Utmanîye. Beyrut: Metbe'e Cerîde Beyrut,.
- Mihemmed, M. E. (1989). Ewdirehman Begê Baban. Bexda: Çapxaneyaya Zeman.
- Nûrî, M. (1927). Edebîyat Kurdî. Jîyan , Jimare33.
- Nûrî, M. (1926). Edebyat Kurdî. Jîyan , 32,.
- Nûrî, M. (1927). Meneqehît. Jîyan , Jimare 53.
- Qanî, B. (1970). Çîrokên Kurdî yên Bi Helbest,. Rizgarî , Jimare (14-15).
- Refîq Hîlmî. (1988). Şî'r û Edebyatî Kurdî. Hewlêr: Çapxaneyaya El Ta'lim El 'Alî.
- Resûl, D. ' . (1990). Edebî Niwêy Kurdî. Hewlêr: Çapxaneyaya El Ta'lim El 'Alî.
- Resûl, D. ' . (1989). Wêjeya Nû ya Kurdî. Hewlêr: Çapxaneyaya (El Ta'lim El 'Alî).
- Resûl, D. ' . (Hewlêr). Wêjeya Nû ya Kurdî,. 1989: Çapxaneyaya (El Ta'lim El 'Alî).
- Secadî, E. (1968). Wêjeya Kurdî û Vekolîn Li Wêjeya Kurdî, . Bexda: Çapxaneyaya me'arif.
- Se'îd 'Elî Se'îd El Deylemî. (1990). El Sure fî El Teşkil El Şî'rî,. Bexdad: Dar El Şi'wîn El Seqafe El 'Ame, .
- Selîmê Silêman, A. R. (1986). Yûsifû Zuleyxa. Moskowa.
- Serwer 'Ebdelrehman 'Ebdella, ,. R. (1996). Qesîde El Neşr fî El Edeb El 'Erebî El Me'esr. Bexdad.
- Taqane, E. (2001). Tofîk Fîkret û Helbestvanên Nûxwazên Kurd. Hewlêr: Çapxaneyaya Perwerde.
- Xanî, E. (1989.). Mem û Zîn. Parîs.
- Xanlirî, P. N. (1241). Şit û Bulendî Şî'r Nu. Kovara Sexin , Jimare 2.
- Xerîb, R. (1981). Temhîd fî El Neqd El 'Hedîs. Beyrut: Dar El Meksuf.
- Xeznedar, C. (1973). Rojî Kurdistan. Bexdad: Çapxaneyaya Dar El 'Hurîye El Teba'e.

Xoşnaw, E. (2002). Helbestên Berevanî yên Kurdî. Silêmanî: Çapxaneya Rûnakbîrî.
Yûnis, E. (1985). El Neqd El Edebî. Çapxaneya El Hîye El Me'esrîye El 'Ame Lîl Kitab.
Zeyn Elabîdîn Motmin. (1371). Ti 'hul Şî'r Farisî,. Taran: Çapxane Taşin.

